

# ROJANÛ

*kovara huneri çandi û edebi*



34  
1992

## NAVEROK

Tevger Serhildaneke milli ye - Baran .....	3
Bı Tove Kangas ra Hevpeyvın .....	8
Zımanê Kurdi û durûtiya Dewleta Tırk-Rojhat.....	12
Çend pırsên xwendın û nıvisandınê- Mûnzûr Çem .....	14
Mem û Zın, wek radyodramatik - Robert Alfton .....	18
Stranên Serhıldana Agri 3- A. Bazidi .....	22
Zargotın, Stranek jı hêla Bingolê - B. Desım.....	24
Berevoka Terman, navê hın hacet û navgınan .....	26
Quncikê zarokan, Kûsiya Geveze .....	28
Weşanên Nû .....	30

هه و النامه كتيب

Sal: 13

Hejmar: 77, Tirheh 1992

ISSN 0283-5355

**XWEDÎ:** KOMKAR-Swêd

**BERPIRSIYAR:** Şêroyê BOTAN

**NAVNIŞAN:** Gustavslundsv.168,1 tr  
161 36 STOCKHOLM

**TELEFON :** 08/26 23 75

**HESAP NO:** PG. 458980 - 0

**UTGIVARE:** Svensk Kurdiska  
Arbetarföreningen

**ANSVARIG UTGIVARE:** Ş. BOTAN

**ADRESS:** Gustavslundv. 168, 1 tr.  
161 36 STOCKHOLM

**FAX:** 08/25 38 57

Pîştî Şorişa Şêx Seid

Raporeke Tırkan

Dî Derheqa Serhildanê û Rewşa Kurdistanê da

# "SERHILDAN TEVGEREKE MİLLÎ YE"

## Beşa Duwem

(Beşê yekem dî hejmarê 33'an da hatibû weşandin)

Werger: **BARAN**

Lê tiştê ku ji van hemûyan, ku min bî kurtî behsa wan kir, mîhimtir e, ev e ku, dî nav kurdan da bir û bawerîya millî roj bî roj xurt dibe û ewê dî duwerojê da bibe sedemê serhildaneke bî tevayî millî. Rasti ev e ku roja îro, lî rojhîlata Feratê hemû rê-qonaxên me bî gundên Kurdan tîji ne. Kurd êriş dikim gundên Ermenîyan (yên ku ji wan vala bûne) bî dest dixin û eger tevdîr neyê stendî, ewê bikarî bin hemû rê-qonaxên me bî dest xî.

Jî ber ku rewşa îro usa eşkere bûye, eger tevdîr dî wextê da bîn stendî, ez bawer im ku, hî wext derbaz ne bûye jî bo nîfûs û nîfûza Tırkan lî wan deran bî serkeve. Eger tevdîr dî wextê da neyên stendî, pîştî demeke kurt emê mecbûr bîminin destê xwe jî wilayetên rojhîlata Feratê bîkîşînin.

Jî ber ku Kurd, heya Enkerê bî firehî cî bûne, pîrs tenê bî windakîrîna rojhîlata Feratê namîne- ku ev tiştê gelek mîhim e lê, lî rojavaya Feratê jî gelek cîyên wek Meletyê wê bîkevî xeterê.

Ez tucar bawer nî nîm ku, dî vê erda dest

Tırkiyê da maye, du mîletê jî eynî nîjad (6) û selahîyet hukîm bîkî. Bona vê yekê, ez ferz dîbinîm ku nîfûs û nîfûza Tırkan dî hemû welat da bê serxîstî. Bî raya min, dî wilayetên da ev tedbîrên jêrî dîvê bê derengî bîn stendî.

1- Cîkîrîna Tırkan dî rê-qonaxên me da:

Erzurum-Xînis-Mûş-Bîtlîs

Erzurum-Xînis-Bulanîk-Exlat-Bîtlîs

Erzerum-Qerekîlise-Mîlazgîr-Erdîş-wan

Mûş-Çepaxçûr-Palo-Xarpît-Meletyê

Xarpît-Erganî-Silwan-Garzan-Bîtlîs

Sêrt-Garzan

Bîrecîk-Suruç-Ruha-Sörek-Dîyarbekîr

Mêrdîn-Dîyarbekîr

Mêrdîn-Mîdyat-Sêrt

Jî başûrê Gola Wanê Bîtlîs-Wan

Jî bakûrê Gola Wanê Bîtlîs-Wan

Lî van rê ,qonaxan dî gundên mezîna da ku wextê dî dest Ermenîyan da bîn, pîraniya malan xîrab bûne, lê erazî bî tevayî dîsekîne. Dî deştê Mûşê da, dî dorhêla Gola Wanê da, dî navbera Mûş û Xarpîtê da- lî Uluowa, lî Palo, dî

navbera Palo û Çepaxçûre da-, da navbera Xarpit û Erganiyê, Diyarbekir û Silwanê da gelek eraziya avi û baş heye.

Eger xebat gor plan û programekê bê kırım, bêyi ku neheqi lı kesi bê kırım, meriv dikare macirên Tırkan lı van deran bı ci bıke û dılşa bıke. Bes ku ew macır heya warên xwe yên nu bı ereban(qamyon) bên kışandin û rızqê wan ê salekê bê dayin. Ciyên ku şimendiferên me û rêyên mezın wê derbaz bın, divê ji nuha va bên tesbitkırın û lı wan deran eraziya metrûk û bê xwedi, heya hatına macıran vala bımıne, heya bı kırê ji neyê çandın. Xasıma lı rê-qonaxên k Erkanê Herbê Gışti nişan dıde, lı wan deran divê gund bêne avakırın ji bo macirên tırkan ku ji sed mali kêmır nebın.

Xweşbûna hewayê, bereketa erdê û rehetiya koçkırınê, macıran wê bıkişine van deran. Hejmarara macıran divê gor imkanên botça me be û ew bı tevayi bên cıkırın û erzaqê ku tê dayin ji bes ji bo salekê be. Û divê anin û ciwarkırına wan bı dezge û plan be.

Gor imkanên botça me, meriv dikare van rê-qonaxan dı deh salan da tji bıke.

Lı ciyê ku malê metrûke tune, meriv dikare ji nuha va erazi bıkıre û heya wexteki betal bıhêle.

Pışti ku ev rê-qonax hatın dagirtın, hıngê meriv dikare Kurdan daxe deştê, ciyê ku erazi lê heye. Û ciyê ku kevır û kuç in. meriv dikare bıke muntiqê memnû ji bo ciwarbûnê.

Pışti ku zmanê tırki bı ser ket, bı gelek rê-olaxan, wek jin anin û dayinê (bı riya zewacê); bı qedexekırına zmanên dın, zehmet derxıstın dı kar û barên resmi da ji bo kesên ku tırki xeber nadın; alıkarı kırım ji bo wan kesan ku Tırki xeber dıdın; bı vi awayi meriv dikare Kurdên ku daketın deştê bıhelıne(asimile bıke).

Bı raya mın tevdırê heri mezın ev e, da ku em bıkarın rojhulatê bıkın malê xwe. Tevdırên dınê ji ev in:

2- Divê em dı navbendên(merkez) wilayetên Meletye, Xarpit, Diyarbekir, Bitlis, Wan, Mûş, Ruha, Erganimadeni û qezayên Erdiş, Adilcewaz, Exlat, Palo, Çarsıncaq, Çemişgezek, Husnıman-sur, Bêsni, Ergani, Hekimhan, Birecık da gıraniyê bıdıne zanyariyê (maarifê), divê em Tırkbûna wan bıkın serê Tırkê wan deran, divê em bı riya Türk Ocakları (7), belediye û hukümetê nehêlin ku dı bajarên piçûk û mezın da kes ji Tırki pêve zmaneki dın xeberde; divê em wan Kurdên ku bo dan û standinê tên bajêr, mecbûr

bıkın ku Tırki hin bın; divê em dı van deran da, ji bo mektebên navçe (orta) yên ku hene û yên ku ji nu va wê çêbın, ji bo dibıstanên şevin (razani) ji nav xelkê wilayetên rojava mamosteyên bı bir û bawer bıbijêrın û bışının û bı vi awayi hukma zmanê Kurdi ji ser tırkan rakın.

Ciyên wek Sêrt, Mêrdin, Midyat û Sawûr ku Erebi xeber dıdın û mêrên wan Kurdi dızanın û eger mideteki dın derbaz be, şık tune, bı tevayi wê bıbın Kurd. Lı derên han divê em gıraniyêke mezın bıdın zanyariyê û Tırki bı hini mêran, bı taybeti hini jınan bıkın û meyla wani ber bı Kurdıtiyê vegerının ber bı Tırkıtiyê; divê em gıraniyêke mezın bıdın mektebên keçikan û miellimeyên xwedi bir û baweri bışının; diyari, xwarın, cıl û tıştên dın bıdın û bı vi awayi keçikan bıkişının mekteban û kingê eleqe ji bo mektebên keçikan zêde bû, em ji hejmarara wan zêde bıkın.

4- Du qezayê Dêrsım, ango Çarsıncaq û Çemişgezek Tırk e û bı taybeti, Çemişgezek bı dereca serhuşki Tırk e. Navbenda Dêrsımê Xozat û navbenda Owacixê û şeş gundên dorê Tırk e. Lı Owacixê jin û mêr, pışti heft salên xwe Kurdi hin dibın. Bı navên wek Abbas Uşaxi, Ferhad Uşaxi, Aşaxi Qereçali, Yukari Qerebali, Bextiyari, Koç Uşaxi, maksut Uşaxi, Şam Uşaxi, Aslan Uşaxi, Bit Uşaxi ji çawa nişan dıdın, ji eslê xwe Tırk in » dı rûbari Elewıtiyê da xwe Kurd dıhesıbının. Ev eşir, bı gotına xwe ji Horasanê hatıne û xuya ye Tırk in (8)- ji ber ku mêrên wan dıkarın Tırki xeberdın- asimile kırına wan, gor kurdên dınê hêsantır e.

Sıfetê Dêrsımıyan ji sıfetê kurdên dınê gelek cudatır e, Dêrsımı jir in û hewesa wan ji bo zanyariyê ji hemûyan zêtır e. Ji xwe, eger lı qezayên wê yên Tırk û lı Xozat û Owacixê û heya lı du qezayên dın ên Dêrsımê dibıstanên razani bên vekırın û pışt ra, mektebeke navçe lı Xozatê, vê armancê pêk tine û Dêrsımê beri hemû ciyan dıke Tırk (9).

5- Ji Meletyê pêve, dı wilayetên dınê da ku dıkevın rojavayê Feratê, tu sedem tune ku Tırkên wan deran hin wek Kurd bên hıştın. Ji ber ku ev, gor ciyên dın kêm in, meriv bereki va bı mekteb, bı diyari, bereki va ji, heya ew dibêjun em Kurd in, dı karên wan da bı çetinahi û bı rê-olaxên dın, dikare wan mecbûr bıhêle ku bıbın Tırk.

6- Ji bo rêvabırına bernamên (programên) ci-

war kırım (iskan) û helandinê divê graniyek bê dayin ser çêkırına xetên şimendiferan lı rojhilatê û divê, çıqas ji dest tê, heya 10 salan em riya hesın bıgihınin ji Qeyseri heya Erzinganê û bı riya Mûşê heya qıraxê Gola Wanê û ji Meletyê heya Diyarbekirê. Bereki va cigirtına Tırkıtıyê lı gund û bajarên ser rê-qonaxan, bereki va ji girêdana cigehên heri mihim bı tırêne bı mıntıqeyên ku pıraniya nıfûsa wan tırk e, rê dıde ku, ew lûlê me lı wan deran bıgre.

7- Dadigeha (Adliya) me bı qanûn û qeydeyên xwe yê heyi nıkare lı wan deran hukma xwe bı ci bine. Ji bo wan deran çêkırına qanûnên taybeti ji bı aliyê siyasi û idari ne rast e. Divê em dı nav sinorên Teşkilatê Esasi (qanûnê esasi) da qanûnên xwe yên heyi bı kar bının û gor wan lı wê derê idare û mehkemeke şıdandi (orfi) saz bıkın. Heya ku bernama me daye pêş xwe bı ci hat, heya wê wextê divê idare şıdandi her bımıne û divê beşa cezayê ji hakimên dadgehê bân stendın û bıkeve destê mehkemên şıdandi û karê cezadayinê gelek bı lez pêk bê. Hakimên dadgehê ku lı hın ciyan bımının, ew ji divê tenê bı beşa huqûqê mijûl bın. Kingê xelk gıhışte wê baweriyê ku hukumeta mıntıqê heqên wi dıparêze û êdi çüyına cem hakim çêtır dibine, hıngê beşa cezayê ji hêdi hêdi dıkare bıkeve dest hakimê dadgehê.

8- Bernama civarkırınê û helandinê bı riya idara şıdandi bı hêsani pêk tê. Hın kesê ku dıji bı karhatına bernamê derkevın, yan idara zordesti û serdestiyê bıkın; hın kesên ku, meriv bıghê wê baweriyê ku bı hebûna xwe lı wır wê zırarê bıdın; xısım û merivên wan kesın ku pıştıgırıya serhıldanê kırına, yan tê da seri kışandına, dı ci da ye, ku bı bıryara mehkema şıdandi ji mıntıqa idara şıdandi bêne derxıstın û lı ciyekı dın bêne ciwarkırın. İdara şıdandi dıkare bı reheti alıkarıya wan gundên Tırkan yên nu têne avakırın bıke, ku lı wan deran bıngêh bıgrın û wan ji êrışên der û dorê bıparêze.

9- Ji bo jiyana eşiriyê bıghê dawı, divê beri hertıştı hukumet bê xurtkırın û xelkê eşirê bıghê wê baweriyê ku hukumet dıkare can û mal û heqên wan bı tevayı bıparêze.

Pırşa eşirtiyê bı tevayı pırseke cıvaki û abori ye. Kesên ku nıkarın bı serê xwe heqê xwe bıstının lı pıştıgırıyê dıgerın û bı vi awayı bı hukmê serokeşıran ra razi bıbın. Gor xelkê eşıran, serokê eşirê ji hukumetê zef xurttır e û

zef bı zor e. Dı nezera wan da serokeşır hertışt e. Heya ku hukumetê ji serokeşır xurttır ne bine, ji hemû daxwazên wi ra dibêje erê. Guh nade daxwaz û fermana hukumetê.

10- Divê binayên hukumetê, ango qonaxên wılayetan, qezayan, nehyan û qereqolên cendırman gor nav û êtıbara hukumetê bân avakırın û raxıstın; divê qonaxên hukumetê yên wılayet û qezayan ji xaniyên axayên wê derê mezıntır û xweştır bân çêkırın. Eger hewce be, meriv qereqolan bo mıdeteki wek kela çêke ji bo parastınê çêtır e. Da ku xelkê nezan, bı mezinahi û qewımıya binayan ji bıbine ku hukumet ji axan xurttır e.

Lê bo avakırına van binayan ji botçê pere veqetandın gelek çetın e. Meriv dıkare, çawa lı Rûmeliyê (lı hêla Ewrûpê) ji wexteki dıbû, ji xelkê wan mıntıqan alıkarı bıstıne û qonaxên qeza û nehyan û qereqolan bı vê alıkarıyê ava bıke. Wılayet dıkarın bı wezaretı hundurı ra bıdın bıstının, da ku bo alıkarıyê bıryarek bê stendın.

11- Divê erazi rojki berê bê qeydkırın û eraziya neqeydkırı û zeviyên ku nu hatıne vekırın, rez û baxçe bıla bân zanın; erazi bıla bı navê xudıyan bê qeydkırın û beş û salme ji wan bê stendın. Bı vê qeydkırınê qezencek nu ji bo hukumetê dertê û ew ji berê mesrefên nu dıgre. Dı roja iro da beşa eraziyê wek hiç e û lı gelek ciyan nivê pez û dêwer ji nayê nıvisandın.

12- Divê nıfûsa mıntıqê bê qeydkırın û wezifa eskeriyê lı wan deran ji bı ci bê. Nuha lı wan deran, gelek kêm be ji, hınek ji xelkê bajaran eskeriyê dıkın. Nıfûsa neqeydkırı zef e, û ji yê qeydkırı ji pır kes guh nadın gaziya hukumetê û eskerı nakın. Xortên wê derê lı ciyê ku dı parastına welat da beşdar bın, tım bo zêdekirına nıfûsê dıxebıtın. Kesên ku çaxê wan ên eskeriyê hat, divê bân komkırın û lı rojava dı avakırına xetên tırênê û şosan da bêne xebıtandın, heya ku ew bernama gotı bı ci hat, bıla xızmetên bêçek bıkın.

13- Mın raya xwe lı jorê gotı bû: ev tedıbata ku dı dema serhıldana dawı da hatı bû kırım, ne bı wi şıkli bû ku bıbe ibretek mezin. Hukumet, mesrefê ku ji bo vemırandına vê serhıldanê kırıye, dıkare lı 10-15 salan par bıke û ji xelkê vê mıntıqê bıstıne (10). Rewşa xelkê iro gelek mısaid e, dıkare vê mesrefê bıde. Lê kesê ku dı serhıldanê da ci negirtına lı der bımının (bedel ji wan neyê stendın) gelek baş dıbe. Meriv dıkare mesrefê serhıldanê gor hal û hebûna wan lı gun-

dan belavke, yan ji gor nifûsê lı wan par bıke.

14- Stendına çekên kurdan ji divê gor plan û programekê be. Eger icab dıke ku eşirên ser sinoran heya demekê dın çekên xwe bıparêzın, hingê bıla ji wan ra wesiqe bê dayin û ji yê dınê hêdi hêdi çek bêne stendın. Helbet tenê komkırına çek û silahan ne bes e, divê gerandına çekên bê wesiqe ji bê qedexekırın.

Kesên ku dı mıntıqa idara şıdandı da bı çek bıgerın divê bën cezakırın. Usa nebe, ciyê çekên komkori çekên dıgre û ticariya çekê qaçax dıbe kareki gelek baş. Ew liwayên (alay) eşiran yê suwari, ku hukumetê bı destê xwe çekırın û çek danê, lê heya nuha feydek jê ned-it, divê êdi bën belavkırın.

15- Hemû memûrên ku ber bı wi ali dıçın bı dıl û daxwaz naçın. Weki bı zorê dıçın. Yê ku gelek waxt e lı wan deran ın ji, bo ku mektebê nabinın zarokên xwe bıdın xwendın û ji gelek tıştên dınê mehrûm ın, ji halê xwe ne razi ne û dıxwazın rojki berê neqlê rojava bıkın. Pıraniya memûrên wê derê dı dereceki nızım da ne gor memûrên merkezê û rojavayê. Divê pêşı lı vê yekê bê gırtın û bona wê ji, hema isal qanûnek bı çend bend bê derxıstın, ji bo hemû memûrên dewletê xızmeta mecbûrı bê danın û yê ku neçûn wan deran heqê terfiyê wında bıkın. Divê xızmeta mecbûrı ji sê salan kêmır nebe û ew sê salê wê, wek 4,5 û 5 sal bê hısêbkırın û meaşên wan ji wek yê memûrên xweşiyê (sıhhiye) bı navê bedêl (tazminat) yan tışteki dın, piçek bê zêdekırın. Bı vi awayı meriv dıkare memûrên xort û jêhati bışine wan deran. Qezencên wan deran berê mesrefê wır nagire; bona vê yekê, divê meaşên memûran, wek lı merkezê û rojavayê dıbe, dı wextê da bê dayin, da ku ew ji derdê debarê(iaşe) azad bıın.

Lı wilayetên Rojhilatê û lı hemû welat, yek ji pırsên heri bıgehın pırsa cendırme ye. Cendırme bı vi hali tıcar nıkare lı rojhilatê esayışê bı kar bine. Jı bo başkırına rewşa cendırme divê gırani bête dayin ne ser çendaniya wi, lê çawniya wi. Ger usa nebe û wek iro xortên ku talım û terbiyeyê eskeri ne ditne bêne xebıtandın, jı cendırme lı ciyê feyde zırar pêyda dıbe. Lı rojhilatê pır caran tê bıhistın mu pênc-şeş cendırme bı hevra ji bo parastına jiyana xwe ji şer revine û tıfingên xwe teslim kırıne.

Bı raya mın, bı meaş û mesrefê iro ku em pê çıl hezar cendırme xwedı bıkın, lı ciyê wê, mesrefê sê qat zêde kın û hejmarê cendırme ji sê qat hındık bıkın, feyde ji me ra heye. Eger ew elay-

ên seyyar yê mıntıqê ji bêne ıslahkırın, hingê cendırme debara xwe dı saya meaş xwe da dıke û bı hejmar hındık be jı, dıkare wezifa xwe bı ci bine. Lı rojhilatê cendırme yê sabıt dı gundan da dıbın mêvanê axayan û jı bo debara xwe qurışeki serf nakın. Weki dın debara wan nabe.

Ew 500 qurışê ku bo alafê heywanê wan tê dayin, nivê bedêla mesrefê heywanê wan ji nake. Eger meaşê wan ji neyê zêdekırın, hingê cendırme bêçare jı bo parık nan lı ber xelkê stüyê xwe xwar dıke. Cendırme yê ku nanê axê bıxwe û muhtaci wi be, çawa dıji wi emrê hukumetê bı kar bine? Divê hejmarê cendırme bê kêm kırın û meaşê wan bê zêdekırın, da ku ev kar bê kışandın. Pıraniya teymen û yüzbaşıyan ji neferiyê yan ji jı nav zabetê ihtiyati hatıne. Divê em vê yekê ra ji çareki bıbının.

17- Herhal heyetên mulkiyê yê lêgerinê raporên xwe şandıne. Bı ali rêvebırına karê hukumetê lı wan deran divê wilayetên ku gelek piçûk bûne cardın bën firehkırın. Rewşa cografiyê ne mısaid e ku Dêrsım bê parçekırın.

Divê wilayetên piçûk cardın bën firehkırın û berpırsıyariya mıntıqê ji bıkeve destê reisê eskeri yê heri mezin lı wê mıntıqê, wek reisê idara şıdandı.

Mufettişê ordiyê divê her usa ji bıbe amirê mulki lı başûrê çıyayên Bingolê, Rojhılata Fıratê û lı Meletyê. Tım ji meriv dıkare dı warê idari, abori û dadi da pısporeki mulki bo şewırandınê bıde cem mufettişê ordiyê. Lı sinorên Musul û İranê bûyerên dijayeti wê dewam bıkın. Bona wê yekê, dıgel hêza eskeri ku iro heye, divê dı navbenda Wanê da fırqeqe nu bê avakırın, usa ku, kingê hewce bû, leşkerê me yê ser sinor bê teqwiye kırın û tevgereke Kurdên Wanê û Hekkariyê zû bê vemırandın.

Tevdirên ku mın pêşniyar kırın bı kurti ev ın:

1- Divê Tırkan ciwar bıkın dı wan gundan da ku lı ser rê-qonaxên heri mıhim ın; her usa ji gundên Tırkan yê nu ava bıkın.

2- Graniyê bıdın zanyariyê lı navbendên wan wilayet û qezayan ku Tırk ın lê Kurdiyê zora wan biriyê û bı gelek rê-olaxan tırkitiya wan nasi wan bıkın û zmanı Tırki bı serxının;

3- Lı wan ciyên wek Sêrt, Mêrdin, Midyat û Sawûr ku dı nav mıntıqê Kurdan da ne, erebi xerber dıdın û mêrê wan bı kurdi dızanın, divê em zorê bıdıne mekteban, bı taybeti mektebên keçıkan û bı gelek rê-olaxan keçıkan bıkışının mekteban;

4- Lı wilayetê Dêrsımê, ku du qezayên xwe,

navbenda wilayetê û Owacixê û şeş gundên dorê tirk in û ev yek ji navên eşiran ji xuyayi ye, eslê wan tirk e, li wê derê ji divê em zorê bîdine dibistanên razani(şevi) û zmanê Tırki bi lez belaw bikin;

5- Emê wan Kurdan bikine Tirk, ku li rojavayê Feratê di hin wilayetên da belawbûyi dijin;

6- Çıqa ji dest me hat di zûtirin wexti da, emê riya hesin bigihinin Erzinganê û bi riya Xarpitê bigihinin Mûşê û qerexa Gola Wanê û Diyarbekirê;

7- Emê wan deran qasi deh sala di bin idara şidandi da bihêlin, beşa cezayê bîdîn diwanî Herbi Örfî(mehkemên leşkerî û taybetî) û hakimên dadgehê(adliyê) ra tenê beşa huqûqê bihêlin;

8- Yên ku idîa zordestî û serdstiyê dikin, yê ku tevi serhildanê bûne û piştgiri jê ra kirine û xîsm û merivên wan bila ji muntîqa idara şidandi bêne derxistin;

9- Bona rakirina eşiriyê, divê berî hertîştî hukûmet bê xurtkirin;

10- binayên hukûmetê û qereqolên cendîrman divê bi riya komkirina alikarî, rojki berê bîn çêkîrin;

11- Erazi bê qeydkirin;

12- Nîfûs bê tehrîrkirin;

13- Mesrefê serhildanê ji asêyan bîn girtin;

14- Tevî komkirina çekan, divê xwe ra gerandîna çekan bê qedexekirin û tenê kesên xwedî wesiqe bikaribin çek bigerinin;

15- Ji bo wan deran xîzmeta mecbûrî bê danin, û ji memûrên çûyî ra piçek ji bexîş û zam bê dayin;

16- Cendîrme bi aliyê çawani bê baştirkirin û bibe karekî taybetî;

17- Wilayetên ku piçûk bûne cardin bêne firehkirin, mufettişê ordiyê kuher usa ji reisê idara şidandi(orfî) ye, hin ji bibe amirê mulkî û li cem pîsporên idarî, dadî û aborî wê hebîn;

18- Ew kesên ku di derheqa wan da celb û êh-zar derketiye(ji mehkemê tenê xwestin), eger tevî serhildanê ne bûne, bila bo wan ef yan ji tecil derkeve.

Di dema seferê da tîştên ku min ditin û raya min di vê raporê da ne; wê pêşkêşî cenabê we ye bilind dikim, hezretî paşayî berez

14/Ilon/ 341(1925)

Mebûsê Çankiriyê

Mustafa Abdulhalik (Renda)

## Têbîni

(6) - *Di vê gotinê da xeletî heye; Kurd û Tirk ne ji yek nijad in. Armanca A. Renda ji ne ev gotin e. Ango ew ji dixwaze bibêje ku, "Kurd û Tirk du millet û du nijadên cuda ne û di ser vê erdê da hukma herduyun bi hevra derbaz nabe, divê yek bi serkeve" ..*

(7) - *Türk Ocakları (Ocaxên Tırkan): Ev komele jo bo pêşvebirin û belavkirina çanda Tirkî hatî bûn çêkîrin. Propagandê Tirkîtiyê û nijadparezî ji dikirin.*

(8) - *Xuya ye mebûsê Tirk, Horasanê ji wek mala bavê xwe dihesibîne; lê nizane ku Horasan di dirokê da tîji Kurd bû û iro ji usa ye. Horasan warekî kurdan e û Tirk bi xwe li wir gelek kêman in. Mebûsê Tirk derheqa eşirên Dêrsim da ji derewan dîke. Ev eşirên navkîrî, ta ji bav û kalan kurd in, bi zaravê dimulî xeber didin? Heya vê dawiyê di nav mîrên wan da ji yê ku bi Tirkî dizanî bûn gelek kêman bûn. Ew ji, yan çû bûn li bajaran xwendî bûn, yan li wir dûr û dirêj mabûn. Hukûmeta Tirk, qasî 13 sal piştî van gotinan, di 1938 da ew "Tirkên Dêrsimê" qirkir û gundên wan şewitand, lê di sa ji dev ji gotina "Tirkbûna wan" berneda.. Li ser derewan propagandeyê mezin kir. Ji nav Dersimiyân ji hin kesên bêbext û xweşiroş, bi tîrs, bi peran yan ji bi meqam bi alî xwe da kişand û ew ji bi nav millet ketin, gotin "em elewî ne û Tirk in." Lê di sa ji tesîra vê propagandê û wan derewan heya derecekî bû. Milletê me ne xapîya û dijmîn ji, her çiqas bi zmanê xwe usa digot, ji dil dev ji dijmînatiyê berneda. Iro ev propagandê pûç bûye.*

(9) *Hukûmeta Tirk gor vê siyasetê li Dersimê mekteb çêkîrin û zarokên Dêrsimê birin li mektebên razanî dan xwendin. Lê dawî di sa ji ne gor dilê wan bû. Zarokê ku xwendin ji rewşa gel û welatê xwe hişyar bûn û xelk ji hişyar kirin; welatparêzî di nav wan da bejn da.*

(10) *Mebûsê Tirk bi merhemet û bi wîdan e. Bi kuştina ewqas insan, talana mal û milkê me, şewitandina ewqas gund û bajaran namîne, dixwaze bedêla mermiyên xwe ji ji me bistîne. Wek ku Saddamê xwinxwar ji iro li Kurdan dîke.*

## Sosyolog û zımanzan Tove Skutnabb-Kangas:

*Ji ber ku hejmara Kurdan  
ji bo kuştina fiziki pîr e,  
Türkiye ji ali çandi û zıman va ji  
li kuştina wan digere."*

□ Tu dikari hinek xwe bi xwendevanên Roja nû bîdi nasin?

□□ Ez Fini me û Swêdiya Finlandiyayê me. Ji 14 salan vîrda wek biyani li Danimarkayê rûdinem, bi yeki Îngiliz, Robert Phillipson ra zewicandi me û derbari "emperyalizma zıman", zıman û mafên mirovi gelek kar û xebatên me bi hevra dibin. Zarokên me yê mezın hene. Em li çiftlikek biçûk rûdinên û di goma me da çend seri mihên me ji hene. Mın du nıvisarên doktora û gelek pirtûkên dın nıvisiye.

□□ Ji xebatên te yê ser zıman û kultur, gelek insan te ji niha va nas dikin û navê te bihistine. Tu dikari di derheqa vi mijari da me agahdar biki?

□□ Dı salên 1979-80 da ez ji bo du qursên Bakûri (welatên Îskandinava ra tê goton) beşdari xebateki bûm, ku pere bi dest xım û da ku mamosteyên

Kurd dı wan qursan da hini xwendin û nıvisandına Kurdi bîbın; dı vi xebatê da Mehmet Emin Bozarslan ji wek mamoste beşdar bû. Û piştı vê xebatê mın bi çalaki bala xwe da ser pırsa Kurdi. Mın pêşengiya gelek xebatan kir, ku pevgerêdana van xebatan bi pırsa duzimani, perwerdegariya hûrgelan û mafên zımani û insani ra hebû. Lê ev xebatên han hım Bakûri hım ji navnetewi bûn. Ez bi gelek grûbên hûrgel ra xebatên aktiv dikım.

□ Tu, dewletên ku Kürdistanê di nav xwe da parvekirine û bi taybeti ji siyaseta wan a zımani û çandi çawa dibini, çawa şrove diki?

□□ Dewletên ku Kürdistan dagirtine û di nav xwe da parvekirine, ramana "dewleta neteweyi" ji dewletên Rojava wergirtine, ku piştı Şerê Cihanê yê Yekemin qısmen bûne sedemê rewşa iroyin a Kürdistanê û ev rewş hêj ji dom dike. Li gor raman û ideolojiya





*Tove Skutnabb Kangas*

"dewleta neteweyi", dewleteki ideal dewleta neteweyi ye û di dewleteki neteweyi da tenê neteweyek, zimanek û çandek dîkare cih bigre. Eger niha di welat da hin grûbên etnik hebîn, divê vana bêne asimilekirin; na eger vana asimilasyonê napejirinin divê vana bi awayeki din bêne windakirin da ku neyên xuyan. Wek psikolojik (bi inkariya hebûna wan) yan ji wek fiziki (bi kuştin, ji hev belav kirin û koçemal kirinê). Dewleteki neteweyi, hebûna hûrgelan, zimanê wan û çanda wan li hember xwe wek zextek dibine û his dîke. Ji ber wê yekê ye ku, bi gelek metodên cuda li qirkirin û windakirina hûrgelan digere.

Ez, siyaseta Tirkîyê ya iroyin wek qirkirina gel a zimani û çandi dibinim, û pêra ji wek qirkirinek fiziki ya gelêri şirove dikim. Dema ku hejmara Kurdan ji bo kuştina fiziki gelek e, Tirkîye ji ali çandi û ziman va li kuştina Kurda digere. Bi

kuştineke fiziki ya gelêri ji holê wînda dibin, qir dibin; û disa bi qirkirina zimani û çandi ya gelêri Kurd wînda dibin, asimile dibin û dibin Tirk.

Wek tîşteki siruştî zarok ji mezînan bêtir diêşin, tadeyê his dîkin. Û dibistan her dem wek navginek asimilasyonê tê bi kar anin. Gava zarok bi zimanê xwe dixafin, wek fiziki tîen cezakirin û pêra pêra zorê dibinin da ku ew ji zimanê xwe, dê û bavên xwe, çanda xwe û Kurditiya xwe şerm bikin; da ku bi bir raya û xwe ya "azad" helandina xwe bipejirinin û li vê derê dibistan û siyaseta dibistanê dîkeve dewrê û vi kari bi cih tine da ku Kurditi, zimanê Kurdi, dêlva ku bibe çavkaniyek, bibe handikap, bibe marê nivkuştî û bi qusûr. Bêguman tu kes naxwaze bibe handikap an ji kêmketi û bi qusûr. Her bi vi awayî siyaseta ziman a fermi hewl dide da ku zarokên Kurd dev ji çavkani û heyiyên xwe yên heri

giring, ên ku wek materyal nayên pejirandin (jî ali siyaseta fermi va), zimanê Kurdi û çanda wi berdîn. Wisa xuyaye ku Îran, Iraq û Sûriye ji eyni siyaseta dajon, lê siyaseta Tirkîyê ya ziman a heri xirab e. Jî bo kuştina zimanek, dî dinyayê da bî qanûnên xwe yê barbari emsalek wek Tirkîyê tune.

Andres Sütö, niviskareki Roman-yayê û jî hêla Transilvanyayê ye û ew weha dibêje: **"Eger insaneki bî zor-dayinê dev ji zimanê xwe berde, maneya jiyana xwe wînda dîke. Xelkek xwedî rîhek genetik e, û ev rîh heri baş bî rîya ziman tê jiyandin."** Eger zimanê Kurdi û çanda Kurdi bête kuştin, hebûna Kurda ji lî holê namine û ev hebûn nayê vejandin: Jiyan Kurdi maneya xwe wînda dîke û rîhê gelê Kurd dîmre. Û xelkek bê rîh jî bo azadiya xwe şer nake - Jî ber ku tiştêki ku tê jî bo wi şer biki tune- Jî ber vê yekê ye ku, ew siyaseta ziman û kultur a ku dixwaze ziman û çanda Kurdan bîkuje, gelek efektîv e.

Dî nav welatên ku Kurdistanê dagirtine (işgal kirine) bî sîucê kuştina gel a zîmani û çandi Tirkîyê yê heri hov û barbar e, lê Iraq, Îran û Sûriye ji mafên Kurdan ên insani, zîmani û çandi dîde bin lîngan.

Belki pêwîst e ku ez hînek dîn jî lî ser pîrsa kuştina mîletek a zîmani bîsekînim. Gava Koma Mîletan, pîştî Şerê Cihanê yê Yekemin, dest bî vi kari kir, ku paşê bû peymanê pêşbirin û cezakîrîna êrîş û kuştinên gelêri (ango kuştin an jî qîrkîrîna gel lî hember insanîyetê wek sîuc hate pejirandin), dî nav xebatên peymanê da kuştina gel a zîmani û kulturi wek qîrkîrîna gel a fîzîki hate pejirandin. Ev beşa ku jî kuştina zîmani û kulturi pêk tê, heta hevdiya û munaqeseyên dawî hebû û herweha jî gelek dewletan pêk dîhat, lê dî hevdiya dawî da ev xal hate avêtin û dî peymanê dawî da êdî cih nagre (E 739, 1948). Kuştina gel a zîmani dî xala III da weha hate tarîf kirin:

"(1) Prohibition of the use of the lan-

guage of the group in daily intercourse or in schools, or the printing and circulation of publications in the language of the group."

"Dî jiyana rojane da, dî dibîstanan da astengiyên lî pêşîya bîkaranîna zîmanê grûban, an jî tadeyên lî ser belavkirin û weşandîna zîmanê grûban."

Meriv dîkare astengi lî pêşîya bîkaranîna zîmanê hûrgelan derxe, rasterast an jî jî berêvki va (bî awayekî fîzîki an jî bî rîya qanûnan). Dî jiyana rojane da, dî dibîstanan da gava ku dî zarokxane û dibîstanan da jî bo zarokên hûrgelan mamosta tune bin, meriv pêşî lî bîkaranîna zîmanê hûrgelan dîgre. Herweha eger zîmanê hûrgelek dî perwerdeyîyê da neyê bî kar anin, cardî meriv pêşîyê lî bîkaranîna zîmanê hûrgelek dîgre. Tirkîyê vana hemûya dîke, û hema bêje dî wê sewiyê da welatên dîn jî, ên ku Kurdistanê parvekirine. Jî bîlî vana Tirkîyê nahêle ku bî zîmanê Kurdi tiştêki bête çapkîrîn, weşandin û belavkirinê jî. Ango tê wê maneyê ku siyaseta zîman a Kurdistanê, lî gor peymanê Koma Mîletan, qîrkîrîneke gelêri ya zîmani ye.

□ *Wek ku tu jî zani, lî Ewrûpayê nêzi niv mîlyon Kurd dîjn. Gelek astengi û pîrsên zîmani û çandi dertê pêşberî wan. Derbarî vê mîjarê da raya te çî ye?*

□□ *Aşkera ye ku gelek welatên Ewrûpayê yê bî NATO'yê va grêdayî, xwe paş va dîkşînin jî bo ku pîştîgîriya Tirkîyê, hevalbendê xwe yê NATO'yê bîkî. Dî nav daweyên CSCE û Şewra Ewrûpayê da derheqa siyaseta Tirkîyê ya hember gelê Kurd hîm pîrsiyarî hatîne kirin, lê tevi ku Tirkîyê gelek caran bersivên revoke daye an jî heta derewên belgekirî kirîye jî, lî hember wi tedbîrek nehatiye stendî. Beşek jî vê raweyê ew e ku, gelek welatên Ewrûpayê, dî welatên xwe da beşdarî vê sîucê dibî, ango zîman û çanda Kurdan dîkujî, hîm bî siyaseta xwe ya dibîstanan (ku*

meriv li wan deran nîkare bî zîmanê Kurdi perwerdeyi bîke) him ji bî ajotîna siyaseta wîndakîrîna Kurdan a Tîrkiyê û welatên din: Ne wek Kurd, lê wek Tîrk, Îrani, Iraçî û Sûriyeyî tîn qeyd kirin; ew perwerdeyiya zîmanê dayikê (ew tîştên ku li wê derê dertê holê) ne bî zîmanê Kurdi ye, lê bî zîmanê wan welatan ên fermî ne. (ango bî Tîrki, Erebi û Farîsî ne - Tb:A.Gernas); tevi ku Kurd dîxwazî ji, bî zîmanê Kurdi weşanên radyoyê tune; rê didîm ku balyozxane (yên Tîrkiyê, Iraçê, Îranê û Sûriyê - tb:A.Gernas) çalaki û xebatan qedexeyî bikin, ku vana li Ewrûpayê bî her awayî qanûnî ne (kursên Kurdi, raxistî, navlêkirîna zarokan û hwd.), û dipejîrîna ku balyozxane bî awayekî tîkîlî jiyana Kurdan bîbin, ku gava dî rojevê da welatên din hebî divê meriv rê nede tîşteki weha. Çalaki û xebata navnetewî ya koordînekîrî dikare mecala alîkariyê peyda ke, û gelek rêxistînen Kurd ên penaber ji li vê derê xebatek mezin û hêja dikin.

□ *Wek tê zanîn, gelê Kurd ji alî aborî, civakî û çandî va tade dibîne û tê pelixandin. Tu xebatên rêxistînen navneteweyî, yê ku derbarî vê pîrsê da kar dikin, çawa dibînin? Gelo xebat û baldarîna wan a li ser pîrsa Kurdan tîr dîke? Ew, wezîfeyên xwe bî çîhtînin?*

□□ Gelek rêxistînen navneteweyî heta tu bêjî bêçare tîn xuyan, ew, ya tîşteki nîkarî bikin an jî naxwazî zêde bikin. Gelek jê hewl didîm ku tîşteki bikin û belkî jî jî dil dîxwazî, lê hukîm û qeweta wan tune ku bî çîhtî bin. Hinek jî wan zêde tîşt nîzanî, yan jî tîrî xwe çavkani dî bin destê wan da tune. Hinek jê pîlîngê kaxîzan in û bî belavok an jî raweyên başîniyet lê bêmane tîn pêş. Lê divê em jî birnekî û navêjî piştî guhê xwe ku gelek rêxistînen navneteweyî dî çîheki da wek milên zordestên emperyalîst kar dikin, û bala xwe nadîm ser pîrsa gelê Kurd û dî xebata azadiya wî da çîhtînin.

nagrîn.

□ *Jî bo parastîna zîman û çanda Kurdi, digel rêxistînen weha pêwendiyên te hene, an jî planên te yê pêwendiyê hene?*

□□ Him pêwendiyên min hene him jî planên min ên jî bo pêwendiyê hene, lê optimîstîyekî min ê taybetî tune. Em, digel gelek karan, bî deklarasîyoneke navneteweyî ya derheqê mafên zîmanî û mirovî dî bin parastîna Unescoyê da dîxebîtin, lê gelek dijwar e ku meriv xwe bigihîne tîşteki bî qîmet. Ez dî wê baweriyê da me ku divê Kurd bî xwe, xwe temsîl bikin - bêyî ku xwe bî akademîkên şîrî û qurê ên dereke va grêdî, Kurd bî xwe başîrîna dîzanîna ka ew çî dîxwazî. Exlaqê Kurdan ê hevaltîyê heye, lê bî şertên xwe.

□ *Bî rîya Roja Nû jî bo gelê Kurd daxuyaniyek te heye?*

□□ Şerê xwe bîdomînî! Zêtir xwe organîze bikin, bî grûbên hûrgel ên din ra û ew gelên ku li gelek welatan belav bûne pêwendiyê deynî! Bî zarokên xwe ra bî Kurdi bîpeyîvî! Xwendî û nivîsandîna Kurdi hîni wan û hevdu bikin! Bî propagandayên sexte yê derbarî Kurdi bawer nekî - Zîmanê Kurdi, zîmanekî serbîxwe û pêşketîye. Dî Kurdîstanek azad, serbîxwe da zîmanê Kurdi yê pêşketî xwedî hemû îmkanan e da ku wek zîmanekî fermî bîkeve jîyanê û kar bîke. Kurd him dî literatûra kurdi da (wek minak, dî "Mem û Zîn" da) him jî dî nav hevalên min da, him jî him mîr, jî bo min kombînezînek dirêşî ku ez gelek qîmet didîmê: Li alîkî jî bo tîkoşîna û azadî daxwazîyek xurt, berdewamkîrî, li alî din jî evîna û nermayî, ku herdu jî bî aramîna û qewî ne. Hêviya min ew e ku, ez ê gelek jî we li Kurdîsanek azad bibînim, eger zêde bî derengî nekeve? Bîjî Kurdîstan!

*Hevpeyvîna û werger ji Swêdî:*

**A. GERNAS**

# DI DERHEQÊ ZIMANÊ KURDÎ DA DURÛTIYA DEWLETA TIRK

Rojhat

Dî rojên çûyi da lî ser pîrsa "dî TV Tırkan da bî zimanê kurdi program weşandin" gelek bû aktuel. Weki tê zanin heta nuha ne tenê zimanê gelê kurd, hebûna gelê kurd jî, bî awayê fermî dîhate inkarkirin. Ew nêrinên nijadperest, ku hebûna kurdan, welatên wan û zimanê wan inkar dîkin çirokeke kevn e. Ew nêrin bingehê xwe jî zagona esasi ya 1924 an dîgire. Dî serda jî piştî hemû cuntayên leşkerî bî gelek zagonên taybetî va ew hate şîdandin. Bî qedexekirina ziman û çanda me, inkarkirina diroka me, bî zanîstî talankirina eserên diroki lî Kurdistanê armanc ew e ku gelê me bê huviye bihêlin, weka milleteki serbixwe pêşketina wî pêşiyê lê bigirin. Lê hûm lî welat, hûm jî dervayî welat xebatên ku lî dîji dewleta Tirk tê kirin ruyên wan reş kir, politika wan a kolonyalist eşkere kir û dostên gelê Kurd zêde kir. Vê yekê ew mecbûr kirin hûm gavên paşve bavêjin.

Îro hatîye merhaleke usa ku ew bî xwe itirafa derewên xwe dîkin. Serokê komara Tirkîyê T. Özal beyan kir ku dî televizyona Tirkî da bî Kurdi jî program bêne weşandin. Jî ber ku heta nuha dîgotin "netewek bî navê Kurd tune û ew Tirkê çiyayî ne." Ew yeka xwerexnekirina dewleta Tirk e. Niyeta T. Özal çî ye çî nîne, heta nuha partiya wî iktidar bû dî vê demê da ew yek çûma pêk nani ew tîşteki dî e. Lê ev daxwaza daxwazeke demokratîk e û dexwazek jî daxwazên gelê Kurd e.

Wê beyana hanê tansiyona siyasi bî xwe ra bilind kir. Gelek parti û kesên politik dî derheqê vê yekê da nêrinên xwe eşkere kirin. Serokê hukumatê Demirel-ku dibêje "ez realita kurda nas dîkim" bî lez nerazibûna xwe ani zman. Gora Demirelê demokrat" milletê Tirk jî bo wî tîştî ne hazir e, ya duem jî zagona himi lî dij e". Ew her du sebep weka asteng da xuyakirin. Bî rasti "neamadebûna gel" Demirel berxweli (jî

ber xwe) dibêje. Nêrinên leşker, qontrgerilla, MÎT û hûn der û dorên tari, saziyên faşist weka nêrinên gelê Tirk dîxwaze bîde xuyakirin. Dî sêri da dîxwazim bîbêjim ku lî hember heqên Kurdan yê demokratîk nêrinên saziyên faşist û "gelê Tirk yê ku lî dora Çankaya rûdinên û pêra hevpeyvîn hate kirin" ne ciddî ne û jî bo raya gel jî ne pîvaneke realist e. Dî derheqê pîrsa Kurdi da bîyardayim heqê gelê kurd e, ne yê Tirk e. Jî ber vê jî lazim e ku nêrina Gelê Kurd bê girtin.

Em bêjin ku gelê Tirk jî lî dîji vê daxwaza gelê kurd e. Baş e we nêrinên gelê kurd jî girt? Jî boy hûn heqên Kurdan bê naskirin raya gelê Tirk lazim e? Hûn jî boy heqê weşana bî Kurdi nêrinên gelê Tirk dîgirin lê lî dîji kolonyalizma Tirk çûma raya gelê Kurd nagirin? Bî sedan sale ku gelê Kurd jî kolonyalizmê ra seri natewine, lê hûn zîlm û zordariya xwe bî darê zorê dimeşînin.

Heke jî gelê me bê pîrsin, jî vê koletiyê ra yek rojekê jî herê nabêje. Bîla gelê Tirk jî xwe jî wekheviya gelê Kurd ra amade bike. Ma gelê Tirk jî wekhewiyê ra amade nîne, lê gelê Kurd çûma jî koletiyê ra amade be? Gelê Tirk nîkare lî ser dueroja gelê me ipotekê dayne. Bîrati dîvê lî ser pîrensibên wekhevi û demokratîyetê bê meşandin.

Ya duem jî zagona himi weka asteng dîdîm xuyakirin. Ma dilê hukumatê bîxwaze, nîkare wê zagonê biguharîne? Xwedêgravi hukumat bî xwe jî lî dîji wê zagonê ye. Bî kurtî meriv jî Demirelê "demokrat" bîpîrse' tu kingê amade yi jî bo dî Tirkîyê da çikirina demokrasîyek rastîqîni? Dibêjin "reva pîsingê heya kulinê."

Demokratîya Demirel jî heta ciheki. Ew "demokrat" e jî tenê bo parastina kursiyê xwe. Ber ku hercar esker danedîm kursi û wî jê neynînin xwarê. Ortaxê hukumatê, partiya İnönü

(SHP) ji aliki va li ser Kurdistanê " Anadolîya rojhelat û bakur" roporan amade dike û di van raporên da her çiqas heqên kulturi bî nivîs û xwendin bî weşandin dîparêze ji , bî şikileki resmî li dij e û mîl dîde nêrinên Demirel.

Hukumat dibêje ku em realita Kurdan nasdikin. Ma ew çawa naskirina realita Kurd e? Naskirina" realita kurd" bî çî şikîlî dibe? Hîn pîvanên vê tune ye? Hun dibêjin " Tîrkiya dewleteke uniter e"-yek parçe ye- "zîmanê fermî Tîrki ye," bî zîmanên din weşandin, xwendin û nivîsandin qedexe ye, dezgehên kulturi û siyasî, partiyên Kurdî qedexe ne, her roj bî dehan insanên Kurd tîn qetilkirin ma ew e naskirina realita Kurdan? Ew na hemû derew in. Lê roja me ji wê nêzîkta bê. Wê demê hunê bî dayîna gelek tîştan qayil bin û tu durûti wê feyde neke. Ji ber ku em ji we parsê naxwazî heqê xwe dîxwazî.

Dewleta Tîrk ji bo Kurdan bî zîmanê xwe axavtî û weşan heq nabîne û gelek astengîyan derdixîne. Lê ji alî din jî boy Tîrkên derva tu xebatekê şunda nade. Pîştî jî hevketîna Yekîtiya Sovyet heyetên dewleta Tîrk çûn û hatinên xwe Cumhurîyetên Tîrkan, sîxlet kirin. Dî pîrsa Qerebax'ê da vekirî piştgîriya Azerîyan dik e. Fortan didîne xwe û Ermenîyan bî mana êriş birinê dîxwazî bîrsin. Dewleta Tîrk xwe birayê wani mezin dibîni. Îro TV'a Tîrkan berê xwe daye Asya navîn bî kanalên xîsusi (Avrasya) jî boy " brayên" xwe yî Qafkasi û Tîrkên li Awrupa programan dîweşîne. Lê ji bo van daxwazan li ser gelê kurd jî terör û mirinê dibarîne. Ev yeka tenê bî xwe jî nişan dîde ku em ne bîra ne. Hun me bîra nabin, hun bî wî navi bî me henekan dikin. Lê rasti em jî we, yê ku jî rîzgari û azadiya gelê mer a hurmet nakin bîra nabin û dijmin dibînin.

Cumhurîyetên Tîrki dewletên serbîxwe ne, xwedî otorîte û sazîyên serbîxwe ne. Ew gora daxwaza gelê xwe dikarin xwe idare bikin. Yê ku xeracê didîne dewleta tîrk, yê ku hemû mafên xweyî mirovati qedexe ne, yê ku hewceyî azadiyê ne, gelê kurd e.

Hukumata Demirel û Inonû dî destpêkê da li ser demokrasi û heqên mirovatiyê da gelek demagojî kirin .Gelek kes bî derewên wan hatîne xapandin. Lê pîr wext nebuhurî hukumatê rûyê xwe yî nixîmandî da xuyakirin. Ew dî gotinên xwe da çiqas dirist in li ortê ye. Meriv li ser van tîştan vexta ku radiwestê hîn listik tîne xuyakirin.

Em kurd baş dîzamin ew partiyên ku îro dî Tîrkiyê da dîxebîtin, hemû jî li ser yek tîşteki pîr xweşik li hev dikin, ew jî pîrsa Kurdî ye. Hemû parti li ser politika helandin û qelandina gelê Kurd mîna hev dîfîkîrin. Roj tê alîkariya hev dikin, aqil didîne hevdu, piştgîriya hukumatê dikin. Ji ber vê yekê jî tu partiyek dî pîrsa Kurdî da çareyeke demokratîk nafîkîre û jî hev tu ferqiyek van tune.

Bî salane zîman û çanda kurdî qedexe bû. Lê disa jî gelê me ew parastî û bî dewlemendîr gîhande vê rojê. Îro jî gelê me jî her wextê zêtir xwedî imkan e ku zîman û çanda xwe, hebûna xwe bîparêze. Îro konjoktura cihanê jî hate guhartin. Kes guh nade çîrokên kevn. Ew pîroziya sinoran jî nema. Yugoslaviya wê bibe 6 dewletên serbîxwe. Sovyetîstan bû 15 dewletên serbîxwe. Hilbijartina Kurdistanê Başûr jî boy azadiyê hêviyêk mezin da seranserê Kurdistanê. Hîn sazîyên netewî hatîne damezrandin. TV.'a Kurdî jî wan yek sazîyên granbuha ye. Ev bî zîmanê kurdî, bî xebat û weşana xwe dibe çavkanîke çanda me. Ev yek li ser politika Tîrkan jî tesir dike.

Ew dîxwazî vê zilzilê sîvîk derbas bikin. Ji boy vê jî, hîn deriyên piçûk vedikin . Bî dayîna hîn heqên piçûk dîxwazî piçeki çavên Avrupîyan boyax bikin piçeki jî tansiyona gelê Kurd daxînin. Ji bo demokrasî û heqên mirovî bikin ku xwe dî civînên navnetewî da bîparêzî. Alî din va jî, dewleta Tîrk kingê dikeve tengasiyê taktîkên "bîrati" li hember Kurdan bî kar tîne, karê xwe qedand şunda disa çoyê xwe li ser wan dîhêjîne. Îro jî dewleta Tîrk li vê meselê taktîkî lê mêze dike. Heke ev bêgav (mecbûr) nebûna dî TV.da weşandina Kurdî bîla li wir bîsekîne, dî malan da, dî sûkan da, jî peyvê ra jî ew ê razi nebûna.

Çep û demokratîkî tîrkan hîn xwe jî tesîra şoveniyê xîlasnekirîne, ew dî pîrsa kurdî da dengê xwe gelek nîzm derdixînin, jî terora ser gelê Kurd ra çavên xwe digîrin. Ew dîvê en hindîk qandî burjuwayên xwe bî cesaret bin û nêrinên xwe binne zîman. Wê demê em dikarin bî sloganê bîratiyê bawerîya xwe bin.

Pîrsa Kurdî jî boy demokrasîya li Tîrkiyê pîvaneke pîr bîngêhin e. Heya ku gelê Kurd qedera xwe bî xwe tayîn neke, li Tîrkiyê demokrasî bî cih nabe.



Bı pêşketına xwendın-nivisandına Kurdi ra

## DERKETINA HIN PIRS Û TEVLIHEVIYAN

### Munzur Çem

Siyaseta dewletên kolonyalist yên ku Kurdistan xistine bin destê xwe, çawa di hemû waran da, wisa ji di warê ziman û çanda me da ji rê li ber pêşketinê girtiye. Dî hemû parçên Kurdistanê da, li şûna zimanê zikmaki ê gelê me, her yeki ji wan, zimanê xwe (Tırki, Farisi, Erebi) wek zimanê perwerdegariyê li ser gelê Kurd mecbûr kirine. Wan bı siyaseta qedexekirinê û bı her awayî astengi danine ber avakirin û sazkirina dezgehên netewî. Wan nehiştin ku gelê Kurd, di sedsala 20'an da gavên pêşketinê yên ku mumkûn û pêwist bûn bavêje.

Lê, di van demên dawiyê da, li Tırkiyê, di vi wari da hin guhartin xwe didin xuyakirin. Hukumeta Tırk, him ji ber bilindbûna têkoşina gelê Kurd, him ji ber zordan û rexneyên ku di warê navnetewî da derdikeve pêşiyê, êdi ne bı dilê wê be ji, nikare wek berê siyaseta inkar û qedexekirinê bîdomine. Lewma vê dawiyê li Tırkiyê û Kurdistanê xwendin û nivisandina zimanê Kurdi bere bere pêşdikeve, belav dibe.

Li aliyê din, tîştêki tabî ye ku, ev pêşketin bı xwe ra hinek problem û dijwariyan ji tine. Xasma di warê el-

fabe û rêzmanê da hebûna gelş û dijwariyan tîştêki diyar e. Beri her tîştî, ji ber parçebûna welatê xwe û bêî irada xwe Kurd iro sê elfabeyan bı kar tinin. Li Tırkiyê elfabeya latini, li Îran, Iraq û Suriyê elfabeya erebi, li komarên Kavkasyayê elfabeya kirilî derbas dibe. Dî warê rêzman û rastnivisandinê da ji hin pirs û dijwariyên zimanê Kurdi hene û divê bîn çareserkirin.

Li aliyê din, di warê nivisandinê da, dereca pêşkatina zaravên Kurdi wek hev nine. Eger em du zaravên Kurdistanê Bakûr, ango Kurmanci û Zazaki bîdîn ber hev, em ê bîbinin ku Kurmanci pêşketitir e. Lê van demên dawin, di nivisandina Zazaki da ji pêşketineke berbiçav xuya dîke. Helbet mirov bı vê yekê ji dîkweş dibe. Lê çî heye, ku dijwari û kêmasiyên wan hevalên ku vi kari dîkin, ji normalê ji zêdetir e. Gelek ji wana elfabeya Kurdi nîzanin, hin kes ji dikevin bin bandora elfabeya resmi û serdest ku li wi welatî derbas dibe. Hemû ev û hin sedemên wek van, di navbera nivisevanan da dubendi û cudahiyan nivisandinê peyda dîkin. Hin kes, bı awaki bê ser û ber, ji bo hin dengên herfên cuda-cuda dixebitinin.

Disa, li cihê ku qet hewce nake, tu dibini hin ji wana li ser detayên piçûk dîsekînin, û ji bo ravekirina hin dengên tali, li ba xwe tipên cuda çedîkînin.

Helbet dema pêwisti hebe, bi riya zımanzaniyê (lingvistik), bi lêkolîn û xebatên cuda meriv dikare li ser detayên peyv û tipan raweste, û divê raweste. Lê, li gor ditîna min, dervayî vêya, di zımanê rojane yê ku di pratîkê da tê xebitandin, sekinandina li ser variantên piçûk qet hewce nake. Ku em wisa bikin, wê çaxê zıman wê bi ferq û variantên piçûk bîfetise, hinbûn û xebitandina zimên dijwar bibe. Lewma sade û sıvikkirina zımanan, qaideki gîştî ye ku di hemû zımanan da heye. Mesela em di Tırki da li ser dengê ku bi "e" tê ifadekirin bisekinin. Diyar e ku hemû dengên ku bi "e" tînin ifadekirin, ne min a hev in. "e" yê ku di peyvên "Gel" û "neden" da heye, û "e" yê di "beş" û "yeni" da heye, ne wek hev in. Lê Tırk, ji bo van dengên tipên cuda naxebitînin, qîma xwe bi tipeki tînin. Meriv dikare gelek nîmûneyên weha bide.

Lewma li gor ditîna min, hevalên ku nû dest pê dikin bi Zazaki nivîsîn, gerek e bi elfabeya Kurdi ya heyî qîma xwe binin. Ev bes e, têrê dike.

Eger wisa nebe, him bê sebeb di navbera zaravan da, him ji di nav Zazaki bi xwe da ferq û dijberî wê bînin peyda kirin, ku ev tişt tenê wê hinbûn û nivîsandina zıman dijwar bike. Bê şik eynî tişt bona Kurmancî ji derbas dibe.

Lê belê di nivîsandina zaravê Zazaki da, ew ferq û cudahiyan ku bi vi rengî derdikevin holê, ne tenê grêdayî nezaniya elfabeya Kurdi ye, yan ji şirovekirinên cuda ye. Hin ji wan bi niyeteke qenc, lê hinên din ji bi hesab û berjewendiyên siyasî, evê riya han didin ber xwe, û bi zaneyî ferqên sunî derdixin. Armanca wan ew e ku herdu zaravên Kurdi (Zazaki û Kurmancî) ji hevdu dûr bixin û hetta hewl

didin ku "isbat" bikin ew du zımanên cuda ne. Helbet bi vi awayî hin kes dixwazî wisa nişan bidin ku "Zaza ne Kurd in."

Berî sala 1980 bi demekê, kurdekî bi navê Abubekir Pamukçu, ji nijadê tırk ra şîir û pesnên wisa nivîsîn ku tu şarekî tırkan ê herî nijadperest û tırkperwer min a wi nîkarîbû bînivîsiya. Ev tırkperestê han ji nişkava bû pêşverû û kete hepsê, wê çaxê test pê dike bi polêsên tırkan ra dixebite -bi xwe vê yekê itiraf dike- û wi berdidin û ew ji çawa lingê xwe davêje Swêde, jo bo ku dubendiyê têxe nav kurdan, dest bi nivîsandinên "ilmi" kir. Gelekî cehd kir ku isbat bike Zaza ne Kurd in. Disa bi destê dewleta kolonyalist ya ku zımanê Kurdi qedexe dike, Weşanên Dicle-Fırat, hin rêxistin û kesên din bi hevkarîya MÎT'ê ji bo vê armancê tînin xebitandin. Belê ew dewleta ku zımanê Kurdi qedexe kirîye, nuha ji bi destê van kes û rêxistinên han, li ser Zazakî tehlîlan dike û dixwaze wisa nişan bide ku Zazakî ne Kurdi ye.

Bilî vana, disa hin kes û sazgeh hene ku, yan bi navê şoreşgeriyê yan ji bi navê xızmeta zıman û çandê ji bo armanca jorin dixebitînin. Mesela kovara **Berhem** yek ji wan e. Di hejmarê yekemî ya sala 1992'an da, nivîskarê Berhemê iddiayekê tîne pêş ku, li gor bawerîya min tam wê niyeta xirab li ber çavan radixe.

Di nivîsa xwe ya bi sernivîsa "Berhem yeni bir evreye girerken" da M. Düzgün, elfabeya Kurdi ji bo zaravê Kurmancî temam dibîne, qet tîkîlî wê nabe, lê dema dor tê zaravê Zazakî yan ji Dımîlî (Berhem ji van ra dibêje kırmanckî), rewş yekser diguhure; di elfabeyê da cudahi peyda dibînin. Nivîskarê Berhemê, vê guhartinê û sedemê wê weha şirove dike:

"...Mesela di Kurmancî da dengê "ğ" yê Tırki ewqas hundik e ku, meriv dikare bêje tune. Lê ev di kırmanckî

da bî qasi tipên elfabeyê ên dîn pr e. Tîşteki tabû ye ku ji vê herfê ra, dengê ku di fonetika latini da heye û bî "x" tê ifadekirin ihtiyacê bine cih. Disa di Kurmanci da dengê "ü" gelekî kême e. Lê di Kurmanckî da, di hûn hoyên taybeti da dengê u wek "ü" tê telefûzkirin. Disa dengê "s" di hûn hoyên taybeti da wek "ş" tê xwendin. Em şirovekirina ser dengê "ü" bihêlin bona pêşerojê, lê li gor ditina me wexte hewce bike gerek e ji bo xebitandina "ü" em xwe paşda nedin. Di vê rewşê da elfabeya kurmanckî bî gîştî ji van tipan pêk tê:

Aa, Bb, Cc, Çç, De, Ee, Êê, Ff, Gg, Xx, Hh, Ii, Jj, Kk, Ll, Mm, Nn, Oo, Pp, Qq, Rr, Ss, Şş, Tt, Uu, Üü, Vv, Ww, Yy, Zz.

Dengê "ü" yê ku di Kurmanci da heye, di Kurmanckî da tune" (Berhem hejmar 1, rûp.8)

Gerek e meriv jî çend aliyan va li ser vê iddiayê bifikire û wê şirove bike:

a- Diyar e M. Düzgün inkar nake ku di herdu zaravan da jî dengê "g" û "ü" heye. Di şûna wê da dibêje dengê "g" ewqas kême e ku hema hema meriv dikare bêje tune", jî bo dengê ü jî "pîr hindik heye" dibêje.

Di dest da agahdariyeke îstatîkî tune ku bîzambê di herdu zaravan da ev herdu deng çiqas cih digrin, û di kijanê da zehf, di kijanê da hindik hene. Lê wexta min di Berhemê da ev rêzên han xwendin, min herdu zaravên han ku bî hezaran gotinên wan muşterek in, anin ber çavên xwe û ez li ser dûr û dirêj fikirim. Û digel çend hevalên ku li ser zîmanê Kurdi mijûl dibin, me ev tişt munaqêşe kir. Lê belê tu kesekî jî me rasti delileke wisa nehat ku heq bide gotina M. Düzgün.

Li aliyê dîn em bêjin eger wek gotina wi be jî, ku dengê di herdu zaravan da jî hebe gerek e ew bî herfêkê bê ifadekirin. Zehf bûn yan jî hindikbûna wan li pîrsê tesir nake. Lê eger meriv jî xwe ra bike bahane, bêje di filan zaravi da ev deng pirtir heye, ew deng kêmtir heye, û bona vê yekê jî herfên heyî yê muşterek dayne aliyekê, di şûna wê da li gor keyfa xwe herfan

biguhurine, ev êdi ne dikeve çarçova niyeta qenc, ne jî ya xebata zanyari ku niviskarê Berhemê qet jî ser dev û lîvên xwe kême nake.

b- Paşê ew Xx yê ku niviskar Berhemê jî bo zaravê Kurmanckî (Zazakî yan jî Dîmîlî) bî kar tîne, jî aliyê hûn kesan va di Kurmanci da jî hatiye xebitandin û pêşniyarkirin. Mesela Osman Sebri (yek jî niviskarên kovara Hawarê ku di sala 1932'an da dest bî weşandinê kirîye) zûda ev tişt jî bo elfaba Hawarê pêşniyar kirîye, lê Hawarê ev tişt nepejirandiye, jî bo variantên dangan herfên zêde negrtîye nav elfabeyê. Û Osman Sebri jî jî wê ditinê ra hurmet kirîye û ew bî kar neaniye. Disa kurdên Sovyetê zûda jî bo vi dengî û hûn dengên dîn tipên elfabeya Kurdi zêdekirine. Ango eger ev kêmasiyek be jî, ne tenê jî bo Zazakî, lê belê jî bo Kurmanci jî derbas dibe.. Lê li gor ditina min zêdekirina tipan hewce nake. Elfabeya Hawarê ya 31 herfan ku iro pîraniya niviskar û weşanên Kurdi dixebitînin tîra zîmanê me dike û êdi baş bî cih bûye. Lewma ev tesbîta niviskarê Berhemê pûç e, jî rastiye dîr e û niyeta wi jî peydakirina ferqa navbera Kurmanci û Zazakî ye. Tîşteki dîn nîne.

c- Tesbîta M. Düzgün ya ku dibêje "ü" di Kurmanci da heye, di zazakî da tuneye, bî qasi tesbîta jorin pêç û bê bîngê e. M. Düzgün disa rastiyeke heyî berevaji dike, tiştê heyî datîne aliyekê, di şûna wê da dixwaze ya dilê xwe bî cih bike. Ê helbet wê çaxê herfeke heyî jî dikare bibe sîr..

Esasen di bin vê fikra wi da, ku dibêje di Zazakî da "ü" tuneye, niyeteke dîn heye: Dixwaze jî herfa "Ü" ra rê veke û bî vi awayî Zazakî û Kurmanci jî hev dîr bixe. Ma qey Düzgün nîzane ku di Zazakî da jî dengê "ü" heye. Mesela "ü" yê ku di Kurmanci da gihanek (conjontion, bağlaç) e, jî bo Zazakî jî derbas dibe. Dar ü ber, velg ü vas, cêni ü cuwamêrd, kemer ü kuç. Di gel vê, be(ve) jî di eynî manê da tê



xebitandin. Disa di vi zaravi da, paşpirtika forma pıraniya navan "an" "on" yan ji "û" ye. Nîmûne: kem-er-kemerû, dar-darû, bîze-bîzû, De-menû, Alû, Heyderû, seydu û. hwd.

Çawa tê zanin, him di Kurmanci da, him ji di Zazaki da dengên ku bi "û" û "u" tên ifadekirin di hin gotinan da geleki nêziki hevdu ne. Ji hevdu cudakirina wana herdem ewqas hêsan nine. Ev tişt di Kurmanci da ji eyini ye. Çareserkirina tevliheviyên weha zeman dixwaze û bi pêşketina zimanê nivisandinê va grêdayi ye.

d-Digel hemû van tiştan, em wisa bifikirin ku M. Düzgün baweriya xwe bi wan ferq û cudahiyan jorgoti aniye. Baş e, wê çaxê divê meriv çi bike? Ma ne hewce ye ku, qet nebe meriv ve pirsê bine rojevê li ser guftûgoyan bike, û li benda gihîştin û kamîlbûna pirsê bisekine, heta ku di encamê da tewreki muşterek çêbû? Ji nişkava, di hejmara pêşin a kovarê da bi elfabeyeke nû derdikeve holê, ma xêr e? Paşê M. Düzgün ve berpırsiyariyê ji ku distine? Ma guhurandina elfabeyê listika zarokan e, ku ki rabe li gor xwe tipan zêdeke yan ji kêmkê? Ji ziman û çandê ra xizmetkirin eva ye?

Bêşik kes nikare ve yekê bi nezaniya M. Düzgün va grêde. Ji ber ku ev rastiyan basit in, zanineke welê kûr û fireh pêwist nake. Sedemê bîngehiyan van tewrên wi, wek me li jorê ji gotibû; hin hesab û menfaetên wi yan siyasi ne, ji bo rojên pêş. Ez di wê baweriyê da me ku, ji wan hesabên, sempatiya wi ji bo têza "Zaza ne Kurd in" beri gışkan tê. Esasen van demên dawî çavniqandinên niviskarê Berhemê, di ve pirsê da geleki vekiri xuya dike. Mesela di nav wan kesên ku pê ra tevayî weşanan derdixin, hin kes hene ku cudahiya "Kurd-Zaza" diparêzin. Ma qey eva tesadufek e? Disa di nav weşanan Berhemê da pirtûka endameki redaksiyona kovareke din hatiye neşirkirin ku ev kovar bi awaki eşkere iddia dike ku Zaza milleteki cuda ne. Gelo Berhem

çira ve pirtûkê neşir dike? Him ji li ser bergê pirtûkê, di çiroka jiyana niviskar da dinivise ku "li bajarê **Anadoliyê Erzincanê**" hatiye dinê. Em M. Düzgün ji zûda nas dikin. Wi heta nuha **Erzincan** wek bajareki **Kurdistanê** qebûl dikir. İcar nuha Erzincanê wek bajareki Anadoliyê binav dike, gelo ev yek encama kijan guhartinê ye?

Lê çavniqandin û flortên niviskarê Berhemê, di ve çarçovê da ji namine. Ew bi cudakirina Kurd-Zaza qima xwe nayne, serda ji zazayan hêla Dêrsimê wek milleteki din (milletê Kırmanç) qebûl dike. Ji afrandkarê ve fikrê e şaşbûyi ra pesnan rêz dike, ditinên wi li cih û rast dibine û reklama rojnameya wi dike. Diyar e tesbîten wan eyini ne, lê di "çareserkirina siyasi" da -çawa ku bi xwe dibêje, di navbera wan da hin cudahi hene.

Meriv dikare bine hişê xwe û bîpirse: Gelo niviskarê Berhemê çira van ditinên xwe bi awaki eşkere nade xuyakirin, bi awaki şermoke û sergirti vi işi dike? Ez wisa bawer dikim ku ew li benda dema xwe ye. Niviskarê Berhemê, ji berê da xwe wek welatparêzeki Kurd, heta wek sosyalisteki Kurd lanse kiriye. Û bi ve yekê dialog û pêwendiyên cuda danine. Eger di rewşeke weha da fikrên xwe zehf eşkere bike, divê wan dialog û danûstandinan bibire. Hetta di nav hevalên xwe yan nêzik da ji wê bikeve tengasiyê. Ev ji ve gavê li işê wi nayê. Herwisa bi navê xizmeta çand û diroka Kurdan, bi hin dorhêlên ne kurd ra ji pêwendiyên wi hene ku rê nadin ew nuha gaveke wisa bavêje.

Quweta wi çi ye, wê çiqas di ve armanca xwe da bi ser bikeve dişteki din e, lê qet şik tune ku niviskarê Berhemê xwe ji roleke xirab ra amade kiriye. Ew çiqas kirinên xwe sergirti û bi rengeki cuda bixwaze veşêre, disa ji nikare. Ji ber ku rasti li cihê ortê sekiniye.

Ji tirki wergerandin: **Azad NÛBAR**

# MEM Û ZIN

## Wek radyo-dramatik -2

J1 varianteki zargotini (folklorik) hatiye adaptekırın.

### ROLÊN DRAMATÊ

MEM: Zırkurê Alan Paşa  
ZİN: Dota Mir Seydın  
QİSEDAR (MÊR): QM  
QİSEDAR (JİN): QJ  
HESP  
QERETAJDİN  
ERFAN  
ÇEKAN (Çeko)  
BEKİR (Beko)  
DOTA BEKO

Radyodramatizekırın:

ROBERT ALFTON

QM

J1 bo zineki wisa ez sed zêri dıxwazım.

MEM

Ez ê dused zêri bıdime te, eger tu dı nav çıl rojan da tamam bıki.

QJ

Paşê rabû çû ba terzi.

MEM

Terzi! aha j1 te ra sêsed zêrên zer. J1 mın ra destek kincên wisa rınd bıdrûyi ku heya iro tu keseki tışteki wisa spehi neditibe.

QJ

Paşê rabû çû tewla hespên bavê xwe, ciyê ku çıl hespên rehvan têda

gırêdayi bû.

QM

Wi destê xwe yek bı yek lı pışta hespan xıst lê pışta gışkan dı bın destê Memê da daket.

MEM

Lı vır, dı tewla bavê xwe da mın hespeki baş, lı gor dilê xwe nedit.

QJ

Wexta ku j1 tewlê derkete derva, dı hewşa ber deri da dit ku j1 wêda bergirek berbı wi tê. Û lı ser pışta bergir cerên avê barkiri bın.

HESP

Ey Memê, herçiqas ez bergireki avkışandınê me ji, gerek e tu mın ji

carekê biceribini.

MEM

Ez ê te ji biceribinim, herçiqas tu bergireki avê bi ji..

QM

Memê destê xwe li piştê hespê xîst (Deng), hespê tevziyek da xwe ku piştê wi bi qasi çar bihustan di bin destê Memê da bilind bû.

MEM

Lo seyiso! Bavê min heqê te deh zêran dîde, ez ê panzde zêran bîdime te. Evi bergirê han bigre, çil rojan di afirê heri baş da alif bîdê, û wisa baş lê mêze biki ku, wexta avê berdi ser saxriyan av heya nav bijiyên wi here, wexta avê berdi ser bijiyên, av xwe bigihine saxriyan.

QJ

Ciwanmerdan xeber dane Alan Paşa, ku Memê çûye ba zîncêker û terzi û di tewlê da cihê heri baş bona bergireki daye veqetandin. Û tîvdareka rêwing-tiyê dike.

QM

Ez ê herçar simên hespê wi bi zincir û qeydên pola girêdîm. Ez ê dergehê bajêr bi kilitan dadim. Memê kurê min e, divê gotina min ji xwe ra ferman bîzanibe.

QJ

Çil roj temam derbas bû. Memê çû ku zin û kincên xwe bîstine.

QM

Memê hesp ji tewlê kışand, zinê sîpehi lê kir û lê sîwar bû. Lê qet haya jê nebû ku lingên hespê qeydkiri ne.

QM û QJ

Û Memê rehwanê xwe kışand ji tewlê zin lê kir, zineki rind û xemilandi  
Lingê xwe kire zengiyê û gazi kir:

MEM

Ya Xwedê û Pêxember!

QM û QJ

Û ji hespên wi ra peyda bûn cotek bask,  
hespê xwe hilavêt û derbas bû ji sûra bajêr  
bi lingên girêdayi û Mem li ser piştê, firiya û bi ezmana ket û çû.

QM

Memê lawê min were meke vi kari,  
Şehrê Mîxurzemin, nehêle li hêviya min kali  
Ez ê ji te ra binim pêncsed xatûnên bi cari,  
Memê were lawo meke vi kari!

QJ

Memê sê roj û sê şevan hespê xwe ajot,  
Lê qet hay jê nebû ku simên hespê bi qeydên in,

HESP

Herê Memê, mêrxasê mino Memê,  
Ev sê roj û sê şev e,  
Mina teyreki baz min dibezini,  
Qet nabêji qeydan lingê hespê birî,  
Qeydan çerm xwar tenê ma hesti.

QM

Memê delal ji ser piştê peya bû. Ji ber xwe kışand şûrê tevtûj, mina xiyareki birri ew zincir û qeydên pola.

HESP

Herê Memê delal bîpêçe simê min bi destmalan,  
Avde min li ser çavkaniyan,  
Min timarke nazik nazik bi tiliyan,  
Ez ê te bigihînim Cızira Botan,  
Ez ê te bigihînim Zina te ya delal.

QM

Û em ê niha behsa Zina remildar bikin.

QJ

Zina remildar qîza Beko yê. Beko ji xelkê Cızira Botan e û rihsîpiyê mir Seydin e. Lê Zina keça wi hezar cari nerindtir e ji Zina dîn, ya ku gustila Memê li cem e.

QM

Wexta Memê hespê xwe dî ser sûra bajarê Mıxruzemin ra dibezand, lî Cızira Botan, çengek qûm hilda Zina dota Beko, ya remildar û dıxırab.

ZİNA REMILDAR

(Qûmê dî nav tiliyên xwe ra dirjine ser perşomenê) Dî tiliya dota Seydin da gustilek heye. Ev gustil nişana hezkırın û evindariyeke mezın e. Hezkırıyê Zinê, pısmirê çeleng, yê ku dî bajarê bavê wi da 366 minare hene. Ew berbı Cızira Botan Hespê xwe dajo û dajo, qet nasekine. Ê ez ê herım xwe bıdım ser pıra Zembilê û lî benda wi bısekınım. Lı wir ez ê jê ra remileki daynım ku ew êdi heta hetayê Zina Seydin jı bir bıke. Ew bı lez dajo ,dajo, û berbı Cızira Botan tê. (Dengê nalên hespan- effekt)

ZİNA REMILDAR

Tu bı xêr û xweşî hati Memê.

MEM

Tu çawa dızani ku ez Memê me?

ZİNA REMILDAR

Ez dızanım, jı ber ku ev çıl roj û çıl şev e, jı rêka dûr tê, bona ku mın dilberê mın xatûnê jı xwe ra hildi û bıheri.

MEM

(Dı ber xwe da dıfıkire.) Dilber û xatûn.. Ya rebbi, bavê mın got ez ê jı te ra pêncsed xatûnên bı cari binım, ez rabûm seba vê reşa işkeloki heta vıra hatım?..

ZİNA REMILDAR

Memê ez dibinım tu keti nav xem û xeyalan. Qey dilê te jı mın sar bû? Eva çıl roj û çıl şev e, ez lı serê vê pırê lı benda te me. Sır û sermayê, toz û xubara piyê keriyên pez lı mın xıstiye, lewma ez weha reş bûme. Heke tu mın jı xwe ra nebi, ez ê gazi cındiyên Cızirê bıkıım, ku jı cendekê te, parçê mezın tenê guhê te bımine.

HESP

Lo Memê eva qıza Bekoyê Ewan e, Remıldar e, remla xwe datine, Gelek rêwingên mina te, jı riya wan dadigerine.

Ka jê pırs bıke, gelo çı kırıye bı gustila te.

Ev Zina derewin e, ya bê dıl û bê evin e.

MEM

Herê xatûnê ez ê nıha hıساب jı te pırskıım. Bıla ağır bı bedena te keve, jı seri heta paniyan. Ka bêje te çı kırıye bı gustila mın?

ZİNA REMILDAR

Wexta ku jı nışkava çavê mın bı te ket, hışê mın çû, serê mın gêj bû. Wê demê gustil jı tiliya mın kete nav ava çem û wında bû. Ez nıha bê gustil ım.

MEM

Tu derewan diki. Tu sexte yi. Çımki eger Zinê bûya, wê xwe bıxenıqanda, lê gustila mın wında nedıkır. Tu dota Beko yi, rêwingan dıxapini, remlê datini. Bıla careke dın çavê mın te nebine. Nıha ez ê herıme nav Cızirê, cem Zina rasteqın, ya ku gustila mın lı cem e.

QM

Lı deşta Cızira Botan, Qeretajdin bı herdu bırayên xwe va derketıbûne nêçirê. Van hersê sıwaran dabûne dû xezaleki.

QERETAJDİN

Em sê bıra ne, hespên me boz ın dı destê me da çek û gurz ın lı danyayê dıgerın, bı dehw û doz ın.

ERFAN

Em sê bıra ne, hespên me reş ın dınya tev dızane em mêrxasên kıvş ın.

ÇEKAN

Em sê bıra ne, hespên me kumeyt ın bı gurzên mezın dıgerın lı nav wela-tan.

MEM  
Hespê mın ê delal, sê sıwaran dane  
pey xezaleki  
Ka em jı wan ra bıgrın xezalê  
da ku bıbin nas û dost bı wan ra

QM  
Memê hesp ajot (effekt)  
bı êriş çû ser xezalê, hema wê gavê ew  
girt.

QERETAJDİN  
Lo qurba eva nêçira ki ye tu dıgri?

MEM  
Qurba ez xeribê vi welati me  
mın xezal girt lê ne bı niyeta xırab  
ji ber ku gunehê mın bı we hat.

ERFAN  
Ev ki ye , çawa têkılı nêçira me dibe!

ÇEKAN  
Belê,wi heqaret lı me kır.

MEM  
Ez usûla welatê we nızanım,  
Lı cihê ku ez jê tēm, ne eyb û kırêt e ku  
Mırov alikariya ciwamêran bıke.

QERETAJDİN  
Wısa xuya dıke tu jı riya dūr tê.  
Tu wê kuda heri?

MEM  
Ez ê heta Cızira Botan herım.

HERSÛ BIRAN  
Dıçe bajarê me!

QERETAJDİN  
Tu lı çı dıgeri  
Çı karê te heye lı Cızira Botan?  
Ez lı yekê, lı gustilekê û lı ciheke  
starbûnê dıgerım.

QERETAJDİN  
Tu bı xêr bê, were bıbe mêvanê me  
hersê bıran: Qeretajdin, Erfan û  
Çekan.

QM  
Hersê bıran, Memê lı mala xwe lı ser

heft doşekan dan rûniştandin. Rındi  
û spehitiya Memê, ronahiya xwe dıda  
Bırca Belek.

QJ  
Hersê bıra sê roj û sê şevanan  
rûniştın lı cem Memê. Ew jı qısekırın  
û mijûliya wi têr nedibûn. Ew sê roj û  
sê şev mına sıheteki zê derbas bûn.

QM  
Ew lı hember rındi û bedewiya Memê  
wısa heyran û matmayi bûn ku qet  
xwarın û vexwarın ji nedihate bıra  
wan.

QJ  
Mir Seydin, xulamek şande pey Qere-  
tajdin go bıla nesekine zû were.

SEYDİN  
Eva sê roj û sê şev e, tu bı ser me da  
nayê. Wezirên mın bı gotına hevdu  
nakın, lêne ser û guhê hevdu bıxwın.

QERETAJDİN  
Mirê mın, ez bı mezinaya Xwedê sond  
dixwım, ku ev sê roj û sê şev çawa der-  
bas bû nızanım, wetrê gavek, sıatek  
bû derbas bû. Mıvanê mın meriveki  
wısa ye, ku dı vi deri da were, tu wê ji  
rabi ser piyan û xbrhatına wi bıki.

SEYDİN  
Heta nuha em jı ber tu keseki ra-  
nebûne. Ez ê mêvanê û we hersê bıran  
vexwinime cem xwe, hela ka mêvanê  
we çı mêvan e.

QM  
Û wexta Memê jı deri da kete hindur,  
û wexta sılav da Mir Seydin,  
Mir jı sılava wi girt û  
ew jı hêdi hêdi jı ber Memê va rabû.

QERETAJDİN  
Mirê mın, te negotıbû ku tu jı ber  
Memê ranabi? Belê tu jı rabûyi.

(Dûmahik heye)

Wergerandin ji swêdi X. Lezgin

# STRANÊN SERHILDANA AGIRÎ

## 3

Berevkar: A. BAZÎDÎ

### NEMINIM

Dengbêj: ŞAKIRO

Lî lîlo lîlo, lîlîlo lîlo, lîlîlo lîlo, lîlîlo lîlo  
" " " " " " " loo, lîloooo

De lê lê dayê rebenê welatê me Serhed e, ne tu war e,  
Hewi rebenê " " "

Sêr bike jî bextê egîtê mala bavê min rebenê Xudê ra  
Ne payîz e, ne havîn e, ne buhar e,  
Hele bala xwe bidê vê sibêngê qoce zivistan e,  
Gidino, gelo herçar rojê sar e.

Hewi Rebenê lî dû egîtê mala bavê min rebenê mefi'am e,  
Sêr bike jî bona egîtê mala bavê min gulibîra Xudê,  
Ne tu ci ye gidino, ne tu war e, ne sîtar e.

Ez neminim, neminim, neminim, neminim, neminim  
" " " " "

Ca lî piştî egîtê mala bavê xwe rebenê Xudê  
Lî dewrana ax, dinyalîka derew neminim ku neminim dayê.

Hewi rebenê sibe ye dilê min gulibîra Xudê  
Pîra serê danzde rîya heft newala,  
Jî bextê egîtê mala bavê xwe rebenê Xudê,  
Rabîm ser ra derbas bîkîm cotek kari karxezala,  
Ez rûnêmin lî kotîna Qerebilaxê mîfreza Taxîlka,  
Lî ser têl û têlgrafa, lî nav hogîr û hevala  
Min di hurmetek bûkîni dest da dergûşa lawîni  
Kolozekî sîpi ye lî ser desta bû, jî wê dihat,  
Lî çokê xwe dixîst dîgîriya,  
Dîgo lo bîra êêêê, bîra ax bîra, hêy bîra, hê bîra , hê bîra,  
Lê lê anê rebenê lo bîra , lo bîra dîkîr dîgîriya,  
Ber bî taşxana Bazîda şewîti wa direviya,  
Minê xwe berdabû pêşiyê, min go: xwenga min  
Gelo çî bû, çî qewîmi wa çî cîriya?  
Go: brao, belkî agîrê kulê bikeve mala Nîdayî begê,

Saet şeşê dî şevê bû, jî bal xwe derxist fermana serê dî Kurda  
Dî taşxana Bazida şewiti dibijêre egita, efrita û cindiya,  
Lî hewşa lawê Şewêş efendi  
Cinyazê egitê mala bavê mîn gulibîra Xudê  
Dî xwinê da dixemilîne bî singûya  
Tu sêr bike vê sibengê, kolozê egita lî ser destê mîn  
Gulibîra Xudê mane vala, herçî dî mayî sîrgûn dîkîm  
Sinop û Zongildaxê, jî xwe ra nav dîwala.  
Lo axaooo, dilB mîn zeman e, lo maqûlo dilê mîn zeman e,  
Xalîqê alemê lî girtiyê dî hepsan e,  
Rêwiyê dî serê dî riya ne, nexweşê nava ciya ne,  
Cîmaeta hazîr veke dergeyê xêra ne,  
Bînya Bazida şewiti, hewşa lawê Şewêş Efendi dîketîm,  
Mîn di(t) xwîna zengûya da, Sûwanê agirê kulê bikeve  
Mala Nîdayî Begê, saet şeşê dî dî şevê bû,  
Jî ba xwe da derxisti fermana serê dî Kurda ne,  
Jî taşxana Bazida şewiti, tu sêr bike dibijêre  
Egita, efrita û cindiya ne,  
Lî dû egitê mala bavê mîn gulibîra Xudê,  
Mefî'am û bî ferman e.

Ez neminim, neminim, neminim, neminim, neminim

" " " "

Ca lî pîştî egitê mala bavê xwe rebena Xudê  
Lî dewrana ax, dînyalîka derew neminim ku neminim dayê.

### Têbîni:

#### NIDAYÎ BEG:

Lî vîr hînek agahdariyên lî ser bûyerê û Serokleşkerê ordiya tîrkan a zalîm bî navê Nidayî Begê tîn pêşkêşkirin:

Navê Nidayî Begê yê eslî Nidayî Çîkîroxlî ye. Berî Serhildana Agiriyê, lî Qerekosê paşayê eskeriyê bûye. Disa lî wê demê bûye serokê orfî-îdarê û berpirsiyarê Emniyeta Rohilatê, ku paşê navê wê bûye MÎT. Wan çaxan jî Qaxîzman, Qulp, Qerekosê û Bazîd bigre heta Ebexê gîşk dî bîn hukmê Orfî-îdarê da bûye û serok jî ew bûye.

Lî Qerekosê jê ra Nidayî Paşa gotîne. Wexta serhildana kurdan lî çiyayê Gîridaxê, qetîlkarê mezîn tî Bazîdê. Lî Bazîdê jî bî navê Nidayî Beg hatîye naskîn.

Pîştî şerê gîştî, girtiyên kurdan lî Bazîdê zîndani kirîne. Lî bîniya Bazîda jorîn, lî aliyê çepê geliy-eki kûr heyê, dî vî geli da baxçek heyê, jê ra dibêjin Hewşa Şewêş Efendi. Ew qetîlkarê bêîman her şev, bî qasî sed û sedûpîncî girtiyên kurd hîldaye pîşt malan û pîrani jî dî baxçê Şewêş Efendi da kuştîye. Ewî ev karê neînsanî heta pîştî xîlazîya şer jî her berdeyam kirîye. Pîştî tîkçûna serhildana Çiyayê Agirî, rojekê dema jî Çaldîranê diçe Wanê, dî rê da pîr eraqê vedîxwe û pê dimîre, lê hîn henîm ku dibêjin hatîye kuştîn. Dî sala 1948'an da kurê wî jî lî Qerekosê eskeriya xwe bî zabîtî kirîye. Ew jî wek bavê xwe dîndîjîmînê kurdan bûye, û pîr tîştên xîrab lî serê xelkê kurd kirîye.

# Çend gotin li ser zargotinê û Stranek ji hêla Bingolê

Şirove û berhevkirin : B. DERSİM

Berhemên edebiyatê, ji du beşan pêk tên. Yên bî devki û yê niviski.

Ya bî devki ji qimên kevn, bî gotin ji nîşkekê derbazi nîşê dîn bûye û heta iro hatiye. Ew malên gel in. Gora navçe, herêman hin gotinên wê cudabûn nişandîdî, ji ber ku yê ku wan tînin ziman, an ji peşkêşî gel dîkin dikarin hin tîştan lê zêde an ji kêmbikin.

Helbest, kîlam, gotinên pêşîya, hikayet di nava kultur û edebiyata me ya devki (zargotin) da ciheki taybetî digre. Berhemên zargotinî, li ser jîyan û rewşa gel tesireke mezin dîkin. Lê di eslê xwe da kultur û çanda gel, havênê xwe ji bûyer û jiyana maddî distîne. Bî kurtî, kultur û jîyan dualî li hev tesir dîkin.

Hin bûyerên girîng, rojên tal û tirş, zulm û qetliamên dijmin li ser gel, bêmirad mayîna aşiq û maşuqan, jinrevandî, nexwaşiyên bê derman, eskeriya dûr û dirêj, şerên nav eşiran, birçiti, koçkîrî ji warên bav û kalan, û gelek sedemên dîn yê cîvaki û aborî li ser jiyana gel tesir dîke. Hinek ji wana, di diroka cîvaki da dibin kevîrê qorê, destpêka dirokê û dijîn. Weka şerê cihanê 1- 2, serhildana Şêx Seid, Agirî, Dersim, qetliama Helepçê û yd. Gel li ser wan distirê, dîmivîse û dîke nav rûpelên dirokê û dîde jiyandî. Tu zordarî û tedayên dijmin nikare pêşîyê li irada gel bigre.

Aşkere ye ku gotinên devîki emîr kînin. Heta demîkê di nava gel da bêne parastî ji, ew disa ji mehkumê birakirî ne. Ji ber vê jî dîvê meriv hemû fîkir ramanên xwe bike nivîsê û dirokê. Ew yeka ji boy gelê kurd ji usa ye. Ji ber ku em bîndest in, çanda me ya milleti firsêda jiyane dîde me, pêwîste ku em

wê bîparêzî. Em wan ji birkîrî û windabûnê xelas bikin.

## TOLGIRTIN

Eskeriya tırka çûyî hebû pîr caran vegeer tunebû. Ji ber şer, ji ber nexwaşî, birçibûn û teda gelek kes sax venedigeriya mala xwe. Eskeriya dûr û dirêj, şîrî dîkîre nava êlê. Lê pîrê caran ji zarok û jîna wî pêrişan dibûn, kar û barên wan betal dibûn. Helbesta jêrî ji pîrseke ha pêyda bûye. Bûyer li hêla Karêrê-Gêxîyê derbaz dibe, ji boy ku pîrseke cîvaka kurd tîne ziman, me xwest ew neyê birakirî.

Qehremanê kîlama jêrî navê xwe Mîsto ye. Du lawên xwe hene. Navên wan Erzî û Ferqîn'in. Huso ji destbirakê Mîsto ye. Mîsto li bajarê Qersê eskeriyê dîke. Ji rojan rojekê axayê mîntiqê Hemoyê Mîrekan jîna Mîsto Kewagozel dîrevîne û li xwe mar dîke. Destbirakê Mîsto Huso vê xebera digihîne Mîsto. Mîsto ji eskeriyê tê, bî alîkariya Huso Hemoyê mîrekan û jîna xwe dîkuje, şunda vedigere cîhê xwe.

*Mîsto li bajarê Qersê talîm û dersê dibîne*

*Jîna Mîsto Kewagozel Hemoyê Mîrekan dîrevîne.*

*Huso û Mîsto hevra axretburatî girtîne,*

*Huso telgrafekê Mîstora war dîşîne,  
Dwê Mîsto jîna te pê Hemoy Mîrekan çûye.*

*Dwê ware hêfa xwe bî destê xwe bîstîne.*



Ew telgrafa tere bi dest posteci dikevi.  
Posteci "dwê Misto telgrafa te ji wa-  
lat hatiye".

Misto pênc pangnotan ji cêba xwe de-  
raniye,

daye postaci, postaci negurtiye.

Misto ew telgrafa biriyê li yuzbaşiyê  
xwe geriye,

Roj bazar e, yuzbaşiyê xwe neditiye.

Roja din yuzbaşiyê xwe dibine.

Yuzbaşi telgrafa Misto war dixwine

Dwê Misto tu sebirke, sibê tu

yuzbşikê xwe dibini.

Yuzbaşi wê telgrafê digiri li taburê li  
bolugê digerinî.

Ji Mistora mehek û panzde roj çare  
dibini,

Dwê Misto here ji depoyê silaheki  
xwe, tu bikîşine.

Tu here hêfa xwe bi destê xwe bistine.

Misto tere depoyê 1926 T. modelî xefîj  
makîne hoşkêşê dikîşini.

Misto tere ku Huso li ser rîya nehyeyê  
3 roj û 3 şevan war dîsekni.

Misto dibê Erzin û Ferqinê min pê  
çihatne.

Huso dibê Erzin û Ferqin li wê ra-  
zane,

Misto û Huso li wêderê sarmîş hev  
bûne, hevra sond xwarne.

Huso destê Misto gurtiye li dora gundê  
Mirekan sê roj û sê şevan gerandiye.

Ji Kewagozel û ji Hemoyê Mirekan ra  
çare neditiye.

Misto û Huso di nav ormin da  
rûniştine,

Qayt dibin ku sibêda erebek ji gund  
derketiye,

Huso dibê Misto tro 3 roj û 3 şev in me  
xwe kesi nişan nedaye.

Em birçine here pêşiya erebê me ra  
hunek nan jê bistine,

Kincê eskeriyê li tene.

Hemo dibê .....Misto bigihinum,  
Misto li bajarê Qersê talim û terbiye

dibine

Min Kewagozel aniye min ra lawiki  
bine.

Misto ku ji eskeriyê hat ez Misto  
dikujim,

Bila Kewagozel ji min ra temam  
bumine.

Misto vê qisa bi guhê xwe dibihisi,  
Misto dibê hela bisekun Kewagozel ji  
kê ra lawiki tîni.

Misto di paş kêvr da rudini, doqz  
gule li hundir erebê da dirjîni.

Heft heban li ser milê gamêşan da  
veldiqitini.

Wexta ku Misto li wan heftan dixini,

Dibê Huso cihê te bilind e ware sêrê,

eceyiba gran bi çavê xwe bibine.

Misto bûye mina gurê barê pişt şine û  
dev bi xwine.

Çiriya wan tere gund,

Kewagozel pêşiya qizan û bûkan ke-  
tiye lê wan ji dine.

Huso dibê Misto serê xwe ji xewa sibê  
tu heline.

Vay rebê vê alemê nêçira me Kewago-  
zel,

Pêşiya qizan û bûkan ketiye di serme  
da tê.

Misto tere pêşiya qizan û bûkan,

Destê Kewagozel digiri ji nav qizan û  
bûkan dikîşine.

Kewagozel dibê Misto min rûreşiyek  
li ser xwe da var aniye.

Hemo mina xweng û bira kayti min  
bûye.

Huso dibê Misto min nanê destê Ke-  
wagozel pir xweriye.

Kewagozel berde kuva tere bila  
here, qêmişi canê Kewagozel mebe.

Qiz û bûk rawarê Misto pir geriyane,  
ji Misto ra çare nedine.

Misto destê Kewagozel ji nav qiz û  
bûkan disan kîşandiye.

Doqz gule li canê Kewagozel da  
rjandiye.

Fistanê naylon di xwinê da hiştiye.

Telgraf dane elayiyê,

Gotine Misto hatiye li vêdera millet  
qirkiriye,

Cawa telgrafê wêda war hatiye.

Gotiye Misto caran ji elayiyê, ji tabu-  
rê, ji bolugê qet derneketiye. (\*)


#### Têbîni :

(\*) Ev kîlam ji ber devê Kekoyê Fatê  
hatiye wergirtin. Ew bi xwe ji gundê  
Karê, Qeza Mêzgrê ye.

# BEREVOKA TERMAN

## NAVÊ HIN HACET Û NAVGÎNÊN DESTKARIYÊ

çakûç



tevşo



gaz, kelbetan



têlbir




pense




birek




bireka hesinan



mengene



işkence




Xeşeb



dîrêş (dîrêj)



şûjîn



perçin



rende(rinde)




skarpin


mıqar



sator




vide



bızmar, mix



badek, pêçbader, tornevide



torpi



mebred

(torpi ji bo smên heywanan)



kêrtik




mixkêş




qerase, lom, lewye




geran, gıran, balyoz



kuling, tevr




bıvır




bêr



tereziya avê



şaqûl, kaşkol



male




mıfta İngilizi



mıfta fincanki



koşebend



dıraçerx, çerx




somın




pül



zımpere



têlfırçe





## QUNCIKÊ ZAROKAN

ÇIROK ÇIROK ÇIROK ÇIROK ÇIROK ÇIROK ÇIROK ÇIROK ÇI

# Kûsiya geveze



Wêne: B. Wallenius

**W**extekê di golekê da bi navê **Koço û Kejê** du werdek dijiyan. Wan ji wê golê û jiyana li wêderê gelekî hez dikirin. Di golê da gelek masî, beq û şeytanok ji hebûn.

Salekê, havin pîr germ bû. Baran nebarî, gol zuwa bû, av têda nema. Ma werdek bê av dibin, pêwîst bû ku ji xwe ra goleke nû biditana.

- Niha, Koço got, divê em ji

vir herin û ji xwe ra li goleke din bigerin.

- Wak, wak, wak! Ev çî afat bû bî ser me da hat, cih û warê me çawa wêran bû... Kejê got. İcar em Perişan xanimê li vir bihêlin û herin, ew ê bî ki ra qîse bike?

**Perişan xanim** kûsiyek bû. Wê ji gale-galkirîne zehf hez dikir. Dema ku xwe venekîşanda nav qafikê xwe û rane-

za, gereke yek bîdita û pêra qise bıkıra. Bona vê yekê bû ku, hîn ciranan jê ra dıgotın Perişana geveze.

Dema Koço çû jêra got ku ew û jina xwe ji vi wari bar dıkın, Perişan geleki dılşkesti û xemgin bû.

- Wax, wax, wax li mın rebenê, Perişanê got. Ku hûn çûn icar ez ê bı ki ra hevaltiyê bıkim. Ki wê guhdariya mın bıke? Jı xwe ez ji bê av nabım. Xwezi ez ji bı we ra bıhatama!

-Xwişka Perişan, bı rasti wê geleki xweş bûya eger me bıkarıbûya te ji bı xwe ra bıbıra, Kejê got. Lê em ê bıfırın, ez û mêrê mın...

- Erê, erê, Koço got. Em dıkarın wê ji bı xwe ra bıherın. Kejê çiqılê dareki bine, tu bı seriki ez ji bı seriki em bıgrın û Perişanê ji bıherın. Dıdanên Perişanê bı hêz ın, ew dıkare xwe baş bigre. Lê tırşa mın ew e ku Perişan bı zımanê xwe nıkarıbe. Koço vegeriya ser Perişanê û jêra got:

- Nebi nebi ku tu devê xwe vedıkil!.. Kê çı bêje divê tu

bersıva wan nedi. Temam!

- Erê, soz! Perişanê got. Hema hûn mın li vır bı tenê nehêlın, ez dıkarım xwe bıgrım û hiç nepeyvım.

Welê gotına xwe kırın yek û ji bo fırinê xwe amade kırın. Kejê bı seriki çiqılê, Koço ji bı seriki girt. Perişanê çiqıl gez kır û dıdanên xwe lê guvaşt. Bılındi hewa bûn. Perişan dı navbera herdukan da dardakırı bû. Wê ji jor va li erdê dınehêri û geleki kêfa wê dıhat. Ew cara yekemin bû ku li ezmanan dıgeriya.

Dı ser gundeki ra derbas bûn. Wê çaxê çend lawıkên gundiyan ew ditın. Lawık qiriyan û gotın:

- Bınehêrın! bınehêrın! We dit li ezmanan du werdek û kûsiyek dıfırın. Kûsiya fısek nıkare bı piyên xwe here, werdek bı xêra xwe wê dıbın!

Dema Perişanê ev gotın bıhistın, nıkarıbû xwe bıgirta. Û li wan kır qirin:

-Belki çavê we kor be! got û kete xwarê.

(Çirok ji aliyê X.L. va adepteyi kurdi bûye)

# WEŞANÊN NÛ

## DU DIWANÊN CIGERXWÎN: Diwana Yekan û Sewra Azadi

Du diwanên Cigerxwin ji nû ve hatine çapkirin. "Diwana Yekan û Sewra Azadi" bi hevra, di yek cildeki da derket. Ev xebata hêja ji ali weşanxana DENG va li Tirkîyê hate




kirin. Diwan'a Yekan cara pêşin di sala 1945 da, Sewra Azadi ji 1959 da li Şamê, cara duem ji di sala 1979'an da di nav weşanên Pale da hatiye çapkirin. Ji wan çapan pîr hindik nîmûne gihiştine roja îro. Ji ber wê, ji nû ve çapkirina wan diwanan xîzmeteke kêrhati ye. Wek tê zanin pirtûk, bi şîrên xweşik va dagirtî ne.

Ew ne hewceyi zêde gotinan ne...

Di pirtûkê da xeyni pêşgotina wêşanxanê, çar pêşgotinên din ji hene.

Pirtûk 479 rûpel e. Diwana Yekan ji pênc birran, Diwana duem ji çar birran pêk tê.

KEMAL BURKAY



ÇARÎN

Çarin  
Kemal BURKAY

Pirtûka Kemal Burkay ya bi navê ÇARÎN, di nava weşanên Roja Nû da derket. Wek ji nêv ji tê kifş kirin, ew ji çarinan pêk tê. Pirtûk 70 rûpel e û 196 helbestên çarin têda hatine komkirin. Di pirtûkê da rexneyên cıvaki û politik hene. Nivîskar, hîn nexweşi û serêşiyên di şîrê da tîne zîman û bi ûslûbeke edebî rexne dîke. Di her yek çarîneki da gelek mane hatine nîrîrandin. Bi gotinên kîn, gelek pîrs hatine şîrovekirin.

*Di çarinên min da mirov tore tore ne  
Hîn jir in hîn teral, hîn xêrxwaz, hîn fitne ne  
Bê hev nabe zana û nezan, hov û hozan  
Hîn mêr in hîn qelsemêr, bom û baqil hene*  
(165)

Weki nivîskar ji dîde xûyakirin di şîrên wi da gelek cure tipên insanî hatiye resmkirin. Gelek tipên nîmûne di qentera mirovatîyê da diwezîne. Gora giraniya wan qîmet û buha dîde. Ev hemû hewceyi xwendin û fikrîndîneke kûr in.

## Kıtavêki Zazaki:

### "HOTAY SERRA USIVÊ QURZKIZÎ" -Mûzûr ÇEM-Weşanên Roja Nû

Ze ke wendoxi ki zonenê, na seronê pêyênûde eve Zazaki nusnayis roze ve roze avê sono. Qezetêy û kovari herçi ke şî zêde ca danê Zazaki. Bê guman no ki çiyê-de rind o. Kurdki eve na qêyde avê sono û lehçê dêy nejdî yê zuvini benê.

Na heftonê pêyênû de zu ki wertê kıtavonê Roja Nû de, kıtavê de Zazaki vêjiya. Namê na kıtavi "Hotay Serra Usivê Qurzkizi" yo.

Usivo Qurzkiz mordemê de Kurd o. Sera 1920 de, ede dewê da Dersim de amo dina. A dewe gorê taxsimatê dewlete girêdayiyê Qeza Çewligi (Bingol) Kêxi ya.

Nıvıskar(nusekar) Mûnzûr Çemi, na kıtav de hêyatê Usivi nusno. Usivi zof çî diyo, zof meselêy amê sari ser. Dewe de cirani çî turi kewtê tê, aşırû çituri zuvini fetelno, dewlete eve çî şekil milêti rê heqaret kerdo, welat kerdo wêrane, tê de kıtav de ênê eskerakerdene.

Waxto ke serê 1937 û 3198 ine amê, Usiv endi xort biyo. Êy qırkerdisê xelkê Dersimi diyo. Eve xo ki merdene dest ra zor xeleşiyoy, xêlê waxt wertê biri de, kowû ra wedarde mendo.

Ora dime ki tekito şiyoy qurvetiye de gurewo. Onca uzawû ki xêlê tenge diya, vêsaniye, têsaniye û nêwêşiyey onta. Eke bese nêkerdo Tırkiya de idarê xo rind têmin bı kero, na ra ki sano cı, tekito şiyoy Almanya. Ewro hona ki uza ro.

# ROJNAMA AZADÎ DERKET!

Iro gelê me dı şerê demoqrasi û rızgariyê da bûye xwediye çekeki nû. Ji meha Gulanê virda rojnameyê hefteyi, AZADÎ li Tırkiyê dest bı weşanê kır. Ew bı zımanê Tırki û Kurdî ye. Ji 12 rûpelan pêk tê. Li Tırkiyê mediya dı binê kontrola dewletê da ye. Li ser rojname û kovarên demoqrati û pêşverû, xasima yê kurdî kontrol û zordestike gelekî hışk heye. Divê berpirsiyar û xwendevanên wê, gelek astengiyan bigirin ber çavên xwe. Ji bo wê yekê karê Azadi-yê karêki piroz û giranbuha ye.



Armanca Azadi yê ew e ku dı rûpelên xwe da pırsa gelê kurd bine zıman. Ji bo çareserkirina wê pırsê nêrin û pêşniyaran diyar bike, kirinên dewleta turk li dijî gelê kurd aşkere bike û ji bo têkoşina gelê kurd piştgariyê bike.

Ew di de xuyakirin ku rûpelên wê ji hemû kesên welatparêz û pêşverû ra vekiri ye. Dı şerê demoqrasi û azadiyê da em ji Azadiyê ra serkevtinê dixwazim.



# FILMÊN KARTON BI ZIMANÊ KURDÎ



- GÛR Û BIZIN
- ELİBABA Û ÇILDIZ
- ORDEKA KIRÊT
- ELADIN Û ÇIRA YA WÎ

© KOMKAR 1992

Production: **KOMKAR**  
Hensaring 28-30  
5000 Köln 1, FRG

Serkarê dublajê: Barzan Shaswar